



T.C.

Zanîngeha Mardin Artukluyê Enstîtûya Zimanên Zindî Yên Li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind A Bêtez

DI KILAMÊN ŞAKIRO DE ÎDEALÎZASYONA JINÊ

Kamuran DEMİR

19721005

Şêwirmend
Yılmaz ÖZDİL

Mardin 2020

PÊŞGOTIN

Dengbêjî bêguman di çanda kurdî de xwedî cihekî taybet e. Edebiyata kurdî ya devkî bi dengê dengbêjan bi salan li cografyayên cuda belav bûye; dengbêjiyê bi çîrok û kilaman hem hunerek serbixwe pêşkêş kiriye, hem wek ekoleke taybet kevneşopiya bav û kalan neqlî nîfşên nû kiriye. Her çiqas di dengbêjiyê de nivîsîn tune be jî, bi rêya kilaman transîta qewm û bûyeran mîsyoneke cudatirîn li ser vê ekolê bar kiriye. Şevbuhêrkan, leca nav dengbêjan û civatiyê roleke din jî lê bar kiriye.

Çiqas neyê zanîn jî ku ev robara kûr û dûr ji ku destpê dike, em baş dizanin di salên dawî de temsîlkarên wê bi rastî hêmayên xurt di bîra gel de hiştine. Mînak, îro kesayetekî wek Evdalê Zeynikê ji aliyê gelek nivîskaran ve wek “Homerosê Kurdan” hatiye nasandin. Ev, mezinahiya vê ekola kelaman dide nîşandan.

Wek Evdal, helbet Şakiro jî di vî warî de deng daye der û dora xwe. Wî jî ji hostadê xwe yê Reso, ji Evdal, ji gelek dengbêjên din berhem bilêv kiriye. Şakiro ji xeynî kilamên xwe, kilamên wan jî, kilamên anonîm jî gotiye; bi şêwaza xwe kilam xemilandiye. Mijara van kilaman gelek caran bûye eşq, evînî, şer, xweza. Wek gelek dengbêjan Şakiro jî bedewî û delaliya jinan kiriye naveroka kilamên xwe. Ev xebat jî li ser vê îddîayê ava bûye.

Ji ber ku pirtûkên wî, nivîsên wî û piştgiriya wî cesaret da min ji bo mamosteyê min ê biqîmet Ayhan Yıldız; ji ber ku daxwaza şêwirîna min gelek caran bersivand ji bo mamosteyê min birêz Yılmaz Özdil; ji ber ku guhdarvanekî xurt ê Şakiro bû û fikra vê xebatê wî da min ji bo birêz Fecri Polat spasdar im.

Kamuran Demir

Mardin 2020

KURTE

Kilamên ku Dengbêj Şakiro gotine naveroka vê xebatê ye. Di vê xebatê de bi van kilaman ez ê hewl bidim ku bi taybetî di dengbêjiya Dengbêj Şakiro de, bi giştî di çanda dengbêjiyê de “îdealîzasyona jinê” derxînim holê. Armanca min ew e ku di kilamên Dengbêj Şakiro de li gorî şewaza vegotina çav û birû, bejn û bal, rabûn û rûniştin, çûyîn û hatin, exlaq, derûniyê çawaniya îdealîzasyona jinê bidim diyarkirin. Ez ê nişan bidim ku di kilamên Dengbêj Şakiro de jin bi kîjan profilê hatiye wesifandin.

Peyvên Sereke: Dengbêj, Şakiro, Kilam, Îdealîzasyona Jinê

Naverok

PÊŞGOTIN.....	i
KURTE.....	ii
DESTPÊK	1
PLANA BI DETAY	6
I. DENG BÊJÎ ÇI YE Û DENG BÊJ ŞAKIRO KÊ YE?	7
a. Dengbêjî-Di Çanda Kurdî De Hîmeke Çandî.....	7
b. Dengbêj Şakiro-Şahê Dengbêjan	10
II. TEHLÎLA ÎDEALÎZASYONA JINÊ.....	13
a.Di Kilamên Şakiro De Jin Bi Nihêrîna Xûyayî Ve	16
i. Jin-Li Gel Bedena Xwe	16
ii. Jin-Li Gel Kinc, Amûr û Tiştên Din	33
b.Di Kilamên Şakiro De Jin Bi Nihêrîna Tiştên Nexûyayî Ve	40
i. Jin-Li Gel Karakterê Xwe	40
ii. Jin-Li Gel Tevgera Xwe.....	45
c.Di Kilamên Şakiro De Jin Bi Nihêrînên Din Ve	49
i. Şibandina Ajalan	49
ii. Unsurên Din	54
ENCAM	74
ÇAVKANÎ	75
WÊNE	77

DESTPÊK

Problematîk

Ev xebat îddîa dike ku di çanda dengbêjîyê de jin tên îdealîzekirin. Di kilamên dengbêjîyê de tê dîtîn ku jin bi bi çav û birûyên xwe ve, bi tûncik, lêv, çepil û porê xwe ve, bi çûyîn û hatina xwe ve, bi bejn û bala xwe ve, bi rabûn û rûniştina xwe ve, bi exlaqê xwe ve, bi derûniya xwe ve xwediyê cihekî taybet e. Taybetiyeke din a kilaman nezanî, xeberxweşî, xeydokiya jinan e; cil û bergên wan jî, amûrên di destên wan de jî di nav kilaman de tên dubarekirin. Dengbêj feryad û gazî dikin, carinan sond û nifiran dikin; her wiha ji bo jina ku tê îdealîzekirin formên qalibgirtî dikevin nav kilaman. Ev taybetiya jinê ya di nav kilaman de her ku di dengbêjîyê de heye, bi heman awayî di kilamên Şakiro de jî heye. Şakiro, di nav kilamên xwe de car caran pesna jinan dide; ew, wan bi gotinên ciyawaz teswîr dike. Bi van wesifandinan, îddîaya vê xebatê ew e ku di kilaman de di çarçoveya “bedewî”yê de jin zêde derdikeve pêş û ev merhele di lîteratura devkî ya kurdî de cihê xwe diparêze.

Peyvên Sereke, Sînorên Xebatê

Di vê xebatê de wateya “kilam”ê ev e: gotinên helbestkî yên ji aliyê dengbêjan ve li gor rîtmekê tên gotin. Wateya “dengbêj” ev e: kesê/a ku kilaman dibêje. Wateya “dengbêjî”yê ev e: nerîta bi çanda vegotina dengbêjan ve ava bûye.

Di dengbêjiya kurdî de tê dîtîn ku gelek kilam anonîm in. Ji wan hin kilamên ku di nav dengbêjan de belav dibin, ji ber şewaza dengbêjan an jî ji ber hin sedemên din dibin xwediyê versiyonên cûr bi cûr. Bi vî awayî car caran dibe ku afirînerê/a yekemîn ê/a kilamekê bê jîbîrbûn. Em dikarin bibêjin ku kilamên Şakiro gotine, du cure ne. Şakiro hem kilamên ku wî bi xwe afirandiye bilêv kiriye, hem jî kilamên dengbêjên din bilêv kiriye. Ev xebat tenê bi kilamên Dengbêj Şakiro hatiye sînorkirin. Mebesta vegotina “kilamên Şakiro”, “kilamên ku Şakiro gotine” ye. Ji ber ku kilamên tev dengbêjan di xebatê de cih negirtine, li dora kilamên Şakiro gotine xebat pêk hatiye.

Di vê xebatê de bi vegotina “îdealîzasyona jinê” mebest ev e: Di nav hin kilamên Şakiro de dema ku behsa jinekê bê kirin an jî seranser kilamek li ser jinekê were gotin ew

gotinên kilamê bi hin çawaniyên jinê ve tîn xemilandin. Bi gotina "...bejna zirav ji mal derket dimilmilî...", "...ramûsanê li dev û lêvê şekirî...", "...de were piçûka mi were/nazika mi were nezanîna mi were..." Şakiro dixwaze bibêje ku ew kes bejnzirav e, dema ku dimeşe hûrik hûrik bi rê de diçe, dev û lêvên wê şirîn in, ew biçûk e, nazik e û heza dilê min nizane. Bi gelek caran dubarebûna van gotinan ez îddîa dikim ku jin di kilamên dengbêjiyê de tîn pesnandin û îdealîzekirin. Xêynî teswîra beden û organên wek çav, tûncik, tilî; jin bi tiştên ku li xwe dikin jî derdikevin pêş me. Tiştên wek elb ku di destê wan de ye, tiştên wek kofî ku li serê wan e, tiştên wek mêzer ku li ber wan e di kilaman de cûr bi cûr tîn gotin. Dengbêj ji bo jina ku hatiye îdealîzekirin êş û derdên xwe dibêjin, feryadan dikin, li dermanan digerin ji bo xwe. Bi tekrara van gotinên qalibgirtî profileke jinê çêdibe. Herwiha di vê xebatê de gotina "îdealîzasyona jinê" bi vê çarçoveyê hatiye sînorkirin.

Pêwendiya Xebatê bi Xebatên Din re

Ji ber ku di nav kurdan de berhemên wêjeyî, yên folklorîk ji nivîsê zêdetir bi devkî hatine afirandin, li ser zargotin û dengbêjiya kurdî gelek xebat hatine kirin. Bi van xebatan ve pênaseya dengbêjiyê, topografyaya wê derketiye holê û Dengbêj Şakiro jî herwiha hatiye nasandin. Pirtûkên bi van mijaran re têkildar, tez û gotarên li ser dengbêjiya kurdî ji bo vê xebatê bûne çavkanî, herwiha ji bo avakirina teoriya vê xebatê jî bûne alîkar. Pêwendiya vê xebatê bi xebatên berî wê ve heye lê belê ji hêla mijara vê xebatê ve cudahî hene. Di nav xebatan de ez rastî xebatekê nehatime ku di dengbêjiyê de li ser îdealîzasyona jinê hûr bûye. Ev jî ji bo vê xebatê kêmasiyek e.

Rêbaza Amadekirina Xebatê

Ji ber ku di vê xebatê de ew seranser mijareke girîng e, ji bo vê xebatê berê çavkaniyên dengbêjiyê hatine berhev kirin. Ji bo teoriya vê xebatê eşkere bibe piştî dengbêjiyê çavkaniyên li ser Şakiro, bi dû wê re jî kilamên Şakiro hatine berhev kirin. Di beşa pêşîn de pênaseya dengbêjiyê û nasîna Şakiro heye. Bi dû re di beşa din de mijara sereke, îddîaya îdealîzasyona jinê cih digire. Ji bo vê beşa analîtîk çavkaniyên kilamên Şakiro hatine berhev kirin. Ji van çavkaniyan beşên ku jin tê de hatine wesifandin lib û lib hatine hilbijartin. Di bin beş û binbeşan de îdealîzasyona jinê bi her cureyî hatiye nirxandin. Piştî nirxandina van

taybetiyan di kilamên Şakiro de “îdealîzasyona jinê” bi çarçoveyekê hatiye ravekirin. Rêbaza amadekirina vê xebatê bi vî awayî eşkere bûye.

Cudahiya Xebatê

Li ser dengbêjiya kurdî, li ser Şakiro gelek xebat hene. Ji bo berhevkirina kilamên Şakiro ez rastî du pirtûkên stûr hatim, di înternetê de gelek kilamên ku Şakiro gotine hene, em dikarin bibêjin ku kasetên Şakiro jî berdest in. Tezê li ser vê mijarê jî hene lê di nav van xebatan de li ser “îdealîzasyona jinê di kilamên Şakiro de” xebateke berfireh tune an jî ez rastî xebateke wisa nehatime. Cudahiya xebata min jî ji xebatên berî vê xebatê ev e. Min dengbêjî û kilam, di vê çarçoveyê de nirxandiye.

Çavkaniyên Sereke, Taybetiyên Wan

Ji bo vê xebatê min çavkaniyên li ser dengbêjiyê, yê li ser Şakiro, yê li ser folklorê kurdî berhev kir. Her çiqas gelek berhem û çavkanî alîkariya xebata min bikin jî, ji bo vê xebatê berhemên sereke du heb in. Yek pirtûka “Şakiro-Kewê Ribat” a Ayhan Yıldız-Hanifi Taşkın e. Ya din pirtûka “Dengbêj Şakiro” ya Ömer Güneş-İbrahim Şahin e. Ji ber ku van herdu pirtûkan kilamên Şakiro berhev kirine û wan cih dane kitekitên kilaman, min ji van pirtûkan sîd girtiye. Di pirtûka Ömer Güneş-İbrahim Şahin de ji ber ku li gorî mijaran kilam hatine dabeşkirin bi rastî pirtûk gelek bi kêrî min hat. Di nav beşa “kilamên evînî” de ji bo “îdealîzasyona jinê” min gelek kereste bi dest xist. Lêbelê tenê nihêrîna vê beşê têra min nekir; ji ber ku di beşê din de jî, mîsal di beşa “kilamên li ser şer û pevçûnên navxweyî-eşîrî” de jî di derbarê teswîra jinan de gotin hene, di vê xebatê de min cih da tev beşan. Di pirtûka Ayhan Yıldız-Hanifi Taşkın de tiştê ku bi kêrî min hat ravekirina kilaman e. Ayhan Yıldız û Hanifi Taşkın berî nivîsîna gotinên kilamê bûyera/mijara kilamê diyar kirine. Çîroka derketina kilamê, kesayetên di nav kilamê de diyar kirine û bi dû re kilam nivîsîna. Ev jî ji bo baştirîn hînbûna mijara kilamê, kesayetên wê, meseleya wê tiştê girîng e.

Motivasyon

Dema zaroktiya min mezinên me di êvarên dawetan de, di govendan de bi pirranî kilam digotin û li hev vedigerandin. Pêşî mêrekî kilam digot, bi dû re jinekê kilam lê vedigerand û leckirinek derdikete holê. Car caran ev kes jin û mêrên hev bûn û di kilaman de jin car caran dihate pesnandin. Ji ber ku di biçûktiya min de bandora vê çandê gelek li ser min çêbibû, herwiha ev bîranîn bû sedema motîveya min ku ev xebat pêk hat. Ez dixwazim bidim diyarkirin ku dema mezinên me ji bo jinan kilam digotin, dixwastin pesna wan çawa bidin, ji bo wan jineke bedew jineke çawa ye. Bêguman ev daxwaza min, ji bo vê îddîayê bû motîveyeke baş.

Rîskên Xebatê

Bi ya ku ez bi lêgerînan têgihîştim, kilamên dengbêjîyê û yên Şakiro “bi temamî” nehatine berhevkirin an jî ez rastî wan nehatime. Bi qasî ku ez hîn bûm, pêşî bi rêya kasetên berê ev kilam hatine parastin lêbelê hinek kilamên van kasetan ji ber ku kaset xera bûne nehatine tespîtîkirin. Bi dû re ev kilamên kasetan ketine nav internetê, belav bûne. Piştî nivîsîna van kilaman, ew gihiştine roja îroyîn. Wek ku min eşkere kiribû, bi xêra herdu pirtûkên sereke yên rasterast ji bo min bûn çavkanî, ez gihiştim hema hema tevî kilamên Şakiro û herwiha mijara min jî zelaltir bû. Fehmkirina kilamên Şakiro berê ji bo min bû astengiyeke pirr mezin; ji ber ku di hin kasetan de ji ber xerabûna teknîkî gotinên kilaman nehatin zanîn/fehmkirin. Ev kilam di platformên vîdeoyan de jî bi heman awayî ne. Lê belê piştî gihiştina herdu pirtûkan ev pirsgirêka mezin çareser bû. Astengiyeke din nezanîna gotinên van kilaman bû dîsa. Ji ber ku Şakiro peyvên herêmî jî bikar anîbû, ez gelek caran li pey wateyên wan ketibûm. Di hin kilaman de dema ku Şakiro behsa taybetiyeke jinekê dike, ew peyvên ku ez dizanim jî bi şeklekî din dibêje. Ji bo lihevhatina gotinan car caran ew hin gotinên xwe kurt dike an jî ji bo xweşgotinê dirêj dike, ev jî dibû sedema nezanîn/fehmkirina peyv û risteyan. Rîska vê xebatê heye ku ji ber van nezanînan nirxandinên kilaman şaş hatibin kirin.

Di herdu pirtûkên sereke de li gor nivîskaran “kilamên Şakiro” cih digirin ku ew her çar nivîskar jî diyar dikin kilam tenê ne yên Şakiro ne, yên Şakiro gotine jî wek “yên wî” binav kirine. Ev xebat ji ber ku bi alîkariya van herdu pirtûkan hatiye avakirin, rîska duyem a vê xebatê jî ew e ku dibe ku di van pirtûkan de kilamên ku Şakiro negotine jî hatine berhevkirin û ez bi nezanî li ser wan jî xebitîme. Min di vê xebatê de xwast ku ez teswîra îdealîzasyonê jinê tenê bi “kilamên Şakiro gotine” bikim. Lê pirtûkên ku ez li ser xebitîm, dibe ku kilamên Şakiro

negotine jî tev kiribin.

Cureyên Çavkaniyan

Di vê xebatê de çar cureyên çavkaniyan hene. Yek ji van çavkaniyên nivîskî ne. Çavkaniyên nivîskî ji pirtûk, kovar û tezên li ser mijarê pêk tên. Ev çavkanî bi giştî bi dengbêjiyê re, bi jiyan û kilamên Dengbêj Şakiro re, bi unsûrên folklorîk re têkildar in. Yek ji van çavkaniyan kasetên teypan in. Yek ji van çavkaniyan înternet e ku kasetên ku ez negihîştine, kilamên ku min nebihîstine bi derfeta wê ez rastî wan hatim. Her çiqas ev herdu çavkaniyên bi dengî car caran astengî çêkiribin jî, ji bo zelalbûna wateya kilaman gelek alîkarî dane min. Çavkaniya dawîn jî guhdarvanên dengbêjan bûn ku gotinên wan ên li ser mijarê ji bo ronîkirina mijarê girîng bû.

PLANA BI DETAY

1. Pêşgotin

2. Kurte

3. Destpêk

4. Dengbêj Çi ye û Dengbêj Şakiro Kê ye?

(Di vê beşê de min berê behsa dengbêjiyê kir. Piştî vê min behsa Dengbêj Şakiro kir daku bê zanîn ew kê ye, li ku jiyaye û hwd.)

a. Dengbêj-Di Çanda Kurdî De Hîmeke Çandî

(Min behsa dengbêjiyê, taybetiyên wê, girîngiya wê û hwd. kir.)

b. Dengbêj Şakiro-Şahê Dengbêjan

(Min behsa jiyana û hunera Şakiro kir.)

5. Tehlîla Îdealîzasyona Jinê

(Di vê beşê de min analîtîka îdealîzasyona jinê derxist holê. Di kilamên Şakiro de jin hem bi nihêrîna şênber ve, hem bi nihêrîna razber ve çawa ye, min behsa van mijaran kir.)

a. Di Kilamên Şakiro De Jin Bi Nihêrîna Xûyayî Ve

(a) Jin-Li Gel Bedena Xwe

(Çav, dêm, bejn... Jin bi tiştên xuyanî, bi bedena xwe çawa hatiye îdealîzekirin, min behsa vê kir.)

(b) Jin-Li Gel Kinc, Amûr û Tiştên Din

(Kofî, mêzel, laçik, elbik... Jinan çi li xwe kirine, di destê wan de çi heye, min behsa vê kir.)

b. Di Kilamên Şakiro De Jin Bi Nihêrîna Tiştên Nexûyayî Ve

(a) Jin-Li Gel Karakterê Xwe

(Nezan, xeydok, xeberxweş... Jin xwediyê karakterekî çawa ye, min behsa vê kir.)

(b) Jin-Li Gel Tevgera Xwe

(Meş, çûyîna kaniyê, sekinîna li cihekê... Ji di kilaman de çawa tevdigerin, min behsa vê kir.)

c. Di Kilamên Şakiro De Jin Bi Nihêrîna Din Ve

(a) Şibandina Ajalan

(Kew, xezal, kar, berx... Çawa jin ji bo nîşandana delaliyê bi ajalan re hatine şibandin, min behsa vê kir.)

(b) Unsurên Din

(Navên wan çi ne, çawa gazî li wan hatiye kirin, dengbêj çawa li ser evîna xwe sond dixwin... Ji xeynê benda a û b'yê her çi mabin ez li ser wan sekinîm.)

6. Encam

7. Çavkanî

8. Wêne

I. DENG BÊJÎ ÇI YE Û DENG BÊJ ŞAKIRO KÊ YE?

a. Dengbêjî-Di Çanda Kurdî De Hîmeke Çandî

Peyva “dengbêjî” peyveke hevedudanî ye û ji du peyvên pêk tê. Yek peyva “deng” e ku wateya wê “awaz, seda, gazî, bang” e; ya duyem jî ji lêkera kişandî ya peyva “bêjtin”ê, ji “di-bêj-in”ê tê. Dengbêjî hunera gotinê ye. Herwiha dengbêj, kesê ku bûyerên dîrokî û kulturî bi şewaza dengî li gor meqamekî taybet stranê, bi hunereka wêjeyî radigîne civakê ye (Oncu, 2013). Helbet termînolojiya dengbêjiyê bi vê çarçovêyê ve sînordar nîn e. Ev peyv û kevneşopî nîrxên giranbiha dihewîne.

Di peyva dengbêj a hevedudanî de peyva pêşîn deng e. Dengbêj ew kes e ku bi dengê xwe karê bêjtinê dike. Di vî karî de deng meqam, awaz û lorandina kesayet temsîl dike; bi deng dengbêjî çêdibe. Hey caran dengbêjan bi qêrînan temsîla dengê jinan; hey caran bi dengên awarte gazî, hawarî; hey caran bi dengên bilind qehremanî temsîl kirine. Dengê dengbêjan bêguman di nav kilaman de roleke tiyatral girtiye. Dengbêjan bi van dangan bûyerên ku anîne ziman zindîtir kirine, guhdarvanan hema bêja bi van dangan xwe di nav bûyerê de hîs kirine. Bi jest û mîmîkên dengbêjan dengbêjiyê herwiha bi dengdayîna bûyeran ve roleke tiyatral girtiye. Bêjtin bi dengê dengbêjan hatiye temamkirin.

Peyva duyem a dengbêjiyê bêj e. Bêjtin; gotin, qisekirin, peyivîn e. Di vê peyvê de tiştên muhîm ev e ku bêjtin tenê ne stîrîn e. Bi nêrîneke semantîk bêjtin hem gotin, hem strandin e. Mebest di vê peyvê de anîna ziman e. Dengbêjan bûyeran, teswîrên nav bûyeran hem bi stranan, hem bi çîrokan anîne ziman; karê vegotinê kirine. Bêjtin, rasterast naverok e. Melodî, ancax bi naverokeke tijî şêkl digre. Herwiha peyva dengbêjiyê bi du peyvên sereke ava bûye, ji gotina vê peyvê mebest newa û bilêvkirin e.

Di warê dengbêjiyê de kilam, stran û çîrok têgihên muhîm û malzemeyên esas ên dengbêjan in. Bêjeya kilamê ji bêjeya kelam a zimanê erebî çêbûye û bi şeweya kilamê derbasî zimanê kurdî bûye (Yorulmaz, 2017). Stran ji lêkera strînê tê. Stran formeke muzîkê ye. Li gor kilaman kurt in (Yıldırımçakar, 2020). Çîrok, di şevên zivistanan de li ser lêvên çîrokbêjan bi sedan salan e ji nîfşekî digihêje nîfşekî din û bi vî awayî hetanî îro hatine (Bozkoyun, 2015). Li gorî van pênaseyan mirov dikare bibêje ku dengbêj kilaman, stranan û çîrokan dibêjin. Her çiqas bi peyvên wek kilambêj, stranbêj û çîrokbêj hatibin pênasekirin jî ji ber ku dengbêjî erka her sê têgihan tîne cih, mirov dikare bibêje dengbêj ji kesên ku kilaman, stranan û çîrokan dibêje re.

Ayhan Yıldız û Hanifi Taşkın di xebata xwe ya navê dengbêjiyê wek edebiyata dengbêjiyê pênasekirine de cureyên edebiyata dengbêjiyê wek edebiyata gel a anonîm, edebiyata gel a dengbêjan û edebiyata gel a medrese û tekiyayan dabeş kirine. Bi vê tespîtê diyar e ku dengbêjî xwediyê şaxên cuda ye. Berhemên anonîm ên wekî lawik, dilok; berhemên wekî îlahiyan, ên wekî kelaman jî di nav çarçoveya edebiyata dengbêjiyê de tê nixandîn. Herwiha di xebatê de hatiye eşkerekirin ku têkiliya kilaman bi destan, bi hikayeyên gel, bi çîrokên gelêrî, bi zêmar, bi lorî, bi listikên zarokan re heye (Yıldız & Taşkın, 2018).

Dengêj çi dibêjin? Bêguman mirov nikare ji bo vê pirsê sînoreke eşkere derxe holê lêbelê bi qasî ku zêde derdikeve pêş mirov dikare qala çend tiştan bike. Dengbêj çiqas dram, trajedî, keser û keder, xem û xemgîniyên Kurdan hene hemiyar bi navgîniya hunera xwe der dide (Güneş & Şahin, 2019). Dengbêj ji aliyê mijarê ve xwediyê repertuareke dewlemend in. Em dikarin bibêjin ku mijarên wek evîn, şer, lehengî, şîn, qewimînên xwezayî, têkiliyên etnîk mijarên sereke ne (Kaynar, 2018) Di nav kilam û çîrokan de zorî, zehmetî, êş û elem gelek caran derdikevin pêş. Ji xeynî vê kilamên dîlanî, yên ku civatê kêfxweş dikin jî pirr in. Şerên di nav gel de, qehremaniyê van şervanan, serhildanên ku pêk hatine, kesayetên dîrokî bêguman ji mijarên sereke yên kilaman in. Yek temaya ku ji kilam û çîrokan tu caran kêr namîne teqez evîni ye. Çiqas bûyer û naverokên cuda hebin jî di kilaman de, herhal motîfên evîniyê ketine nav naverokê. Herwiha xweza seranser motîfeke berbiçav e. Gelek caran dengê xwezayê, xemla xwezayê, bedewiya wê di stran, kilam û çîrokan de hatiye teswîrkirin. Wek mînakekê motîfa qulingê, bi Evdalê Zeynikê destpê kiriye û bi salan ev motîf di nav kilaman de hatiye bikaranîn. Nêçîrvanî, kevok, xezal, çem.. ji çend dîmenên sereke yên kilamên dengbêjî ne.

Dîroka dengbêjiyê, dîroka vegotinê gelo ji kengê destpê dike? Di derbarê vê de cara pêşîn Homeros tê bîra mirov. Cenga Troyayê nêzî 500 sal berî Homeros hatiye kirin (Demir, Kamuran; Polat, Fecri, 2015). Lêkolîneran waxtê ku li ser ev 500 salên nezelal lêkolîn kirine, îddîa kirine ku ev pêvajoyê bi rêya “kevneşopa destanan a devkî” hatiye domandin. Di vê 500 salî de destanên Cenga Troyayê bi neqla ozanan gihiştîye Homeros. Homeros ku di wê serdema nivîs ji nû ve hatiye bikaranîn de jiyaye, kevneşopa riste bi riste a van destanan neguhirandiye û nivîsiye, bi vî awayî hem bi xwe, hem jî destanên wî bûne mayînde (Demir, Kamuran; Polat, Fecri, 2015). Ev kevneşopiya ku bi Homeros destpê kiriye, di nav çanda Kurdan de navê wê bûye dengbêjî; waxtê Ewropaya Serdema Navîn ‘mînstrel’ û ‘bard’ an ev mîsyon hildane. Di vê serdemê de li deverên din ên Ewropayê em rastî vebêjên çîrokan tên. Li Fransayê ‘trûbadûr’ û ‘trûver’, li welatên ku Elmanî zêdetir lê tê axaftin jî navê vebêjerên çîrokan bûye ‘bankelsanger’(newasazên bankan). Ji xeynî vê li Ingîltereyê ji kesên ku çîrokan bi tevgerên

tiyatral dibêjin re ‘jester’ û ‘mamir’ tên gotin (Cebe, Dengbejlik ve Melizma Tekniği, 2012). Berî nivîsê diyar e ku li dinyayê jî di nav civakên cuda de “dengbêjiyek” e kûr hebûye. Berbiçav e ku dengbêjiya Kurdan jî xurt e û niha jî bi temsîlkarên xwe ve li ser xwe ye. Bi giştî folklorê kurdî û çanda devkî, bi taybetî jî muzîka kurdî, di sazkirina nasnameya çanda kurdî de xwediyê roleke sereke ye. Destpêka vê hunerê gelekî kevin e (Çifçi, 2015). Dîsa bi qasî ku Çifçi diyar kiriye mixabin di nav kurdan de dengbêjê herî kevin ku tê zanîn, Evdalê Zeynikê ye.

Sosyolojiya civakên biçûk, dêrûniya takekesên civakan helbet bi berhemên dengbêjiyê dikarin bîn tespîtkirin. Kilamên ku tîkiliyên nav civatê anîne ziman, çîrokên ku karakterê kesayetan eşkere dikin ji bo dêrûnnasî û civaknasiya objeyên nav berheman hîmên giranbiha ne. Kilamên kurdan mînanî stranên gelên din ne tenê stran in. Taybetiyên xwe hene. Ew hem stran in, hem jî belgeyên dîrokî ne. Hem neynika sosyolojiya kurda û mantalîteya kurda nin û hem jî xezîneya zimanê kurdî ne (Aras, 2017). Tîkiliya dengbêjiyê bi qasî ku bi sosyolojî, psîkolojî û bi dîrokê re heye ewqas jî bi cografyayê re, bi zanistên olî re, bi folklorê re, bi zanista wêjeyê re, bi zanista muzîkê re jî heye. Îfadeya dengbêjiyê bi misogerî tenê vebêjerî nîn e; dengbêji gelek hîmên civatê dide nîşandan.

Li ser dengbêjiyê bi sedan lêkolîn, xebatên cûrbicûr hene. Helbet ji bo bîreke kolektîf dengbêjiyê barekî giran girtiye û wek ekoleke ne fermî erka kişandina fotografa civatê hildaye li ser milên xwe. Dengbêjan bi vê tevgera aktîf hem hunereke serbixwe îcra kirine, hem jî di nav rabirdû û siberrojê de pîrek danîne. Bi rêya neqlkirina nîfşên nû ekol her çûye bi berdeyamî hatiye domandin. Wek ku Uzun jî eşkere kiriye; ango dengbêj; yê/a ku dibêje, yê/a ku gotinê neqş dike, yê/a ku bîrê zindî, sax dihêle, heta yê/a ku hema bi xwe bîr e (Uzun, 2005).

b. Dengbêj Şakiro-Şahê Dengbêjan

Şakiro ji Elajgira Agiriyê ye. Li gorî agahiyên ku Ömer Güneş û İbrahim Şahin didin Şakiroyê birayê yazdeh kesan di sala 1931'ê de ji dayik bûye û kurê Bedîhê Mihê Zîlî ye (Güneş & Şahin, 2019). Li gorî resmîyetê di nasnameya Şakiro de ji bo dîroka jidayikbûnê 1936 hatiye nivîsîn. Dîsa ji gotina Bedîhê Mihê Zîlî tê zanîn ku eslê Şakiro ji eşîra Zîliyan e.

Dengbêjiya (hunervaniya) Şakiro bi koçkirina gundê Cemalverdiya girêdayê Tutakê ve destpê dike ku ev gund gundê Evdalê Zeynikê yê degbêjê navdar bûye jî. Ji ber ku li vê derê Bedihê Kor (Bedihê Çevşuşe) jiyaye û wî dengbêjê navdar Evdalê Zeynikê ditiye, gelek bandora wî li ser Şakiro çêbûye. Şakiroyê ku ji biçûktiya xwe heta 18, 19 saliya xwe li gundê Cemalverdi jiyaye gelek tiştên di derbarê dengbêjiyê de ji Bedihê Kor hîn bûye (Kürtler.com, 2019). Ev agahî dide nîşandan ku di salên xortaniya Şakiro de hem ji ber nêzîkiya cografîk¹, hem ji ber Bedihê Kor ê guhdarvanê Evdal, Şakiro li pey şop û hêmaya Evdalê Zeynikê ketiye. Em dikarin bibêjin ku ne rasterast, lê Şakiro dengbêjekî şagirt ji dengbêjên Evdalê Zeynikê ye. Gelek berhemên wî, ji Evdalê Zeynikê ne (Yıldız & Taşkın, 2018).

Kewê Ribat, Şahê Dengbêjan du leqebên navdar ên Şakiro ne. Ji xeynî van wek ku Salihê Kevirbirî jî gotiye, Şakiro wek Şakirê Mezin û Şakirê Bedîh jî tê nasîn (Kevirbirî, 2009). “Kewê Ribat” ji ber dengê wî yê xweş, “Şahê Dengbêjan” ji ber ihtîşama dengbêjiya wî, “Şakirê Mezin” ji ber hebûna Şakiroyê Biçûk, Şakirê Bedih jî ji ber navê bavê wî wek leqeb hatiye lêkirin. Bi rastî Şakiro bi van leqebên pesndar li gelek deverên ku kurdî lê dijî hatiye guhdarîkirin, bandora wî li ser dengbêjên li dû wî çêbûye.

Her ku em ji agahiyan hîn dibin, di ciwaniya xwe de Şahê Dengbêjan bi evîna Esmera Şukrî kilamên xwe yê yekem bilêv kiriye. Ev keçika ku ji wî mezintir û ya ku wê nedane Şakiro, bûye sedema afirandina kilamên ewil ji bo Şakiro. Herwiha kilama ku bi navê “Esmera Şukrî” tê zanîn, ji kilamên pêştirîn ên Şakiro ye ku wî bi xwe afirandiye û bi xwe gotiye. Demek piştî zewicandina Esmerê, Dengbêj Şakiro ji keçek bi navê Dîlberê hez dike û wê direvîne, li gundê Cemalverdî di hevdeh saliya xwe de pê re dizewice (Güneş & Şahin, 2019). Dîsa bi qasî ku em hîn bûne Şakiro waxtê ku ew bi malbatî diçin Edeneyê zewaca xwe ya duyem jî dike.

¹ Gundê Cemalverdî (bi Tirkî Bulutpınar) gundekî girêdayî Intabê ye. Wek tê zanîn Evdalê Zeynikê jî xelkê Cemalverdiyê ye û heta sî saliya xwe li Cemalverdî maye (Şakiro û Têkilîya Bî Reso re, 2020). Bedihê Çavşuşe ji degbêjên ku em pê dizanin piştî Evdalê Zeynikê yê duyemîn e ku ji Cemalverdiyê dertê (Güneş & Şahin, 2019). Li gel van agahiyan, Şakiro jî tê de em dikarin bibêjin ku Cemalverdiyê heta niha sê dengbêjên navdar mezin kiriye.

Di jiyana Şakiro de barkirina cihên cûrbicûr tê dîtin. Şakiro diçe li gelek deveran dimîne, mala xwe dibe gelek bajarên cuda. Ew gelek dengbêjan nas dike, bi wan re dikeve lacê, ji gelekên wan esasên dengbêjiyê hîn dibe, ji gelekên jibera kilamên Serhedê dike. Wek ku Ayhan Yıldız û Hanifi Taşkın diyar kirine cihên ku mala Dengbêj Şakiro lê geriyaye û lê maye ev in: Bado/Dutax, Elajgir/Cemalwêrdî, Toraqa/Milazgir, Reşayê Sebrî/Qereyazî, Govendik/Xinûs, Çixirxan/Qereyazî, Gazbêl/Qereyazî, li nav Qereyaziyê, Edeneyê, Mûşê û careke din li Qereyaziyê û dawiyê li bajarê Îzmîrê (Yıldız & Taşkın, 2018). Dîsa bi qasî ku em têdigihêjin Şakiro rastî van dengbêjan hatiye: Dengbêj Bedîhê Çavşûşe (cara ewil Şakiro ji wî fêrî esasên dengbêjiyê dibe), Siloyê Gulê, Dengbêj Ferzê, Evselamê Koşkê, Feqiyê Qizqapanê, Mistefayê Çiftborî, Dengbêj Reso, Dengbêj Mihemedê Xilxile, Mihemedê Çêrmelî, Dengbêj Huseyno, Zahiro, Sidîqoyê Zorava, Dengbêj Xalit apê wî bûye lê ji ber ku berî xortaniya Şakiro miriye Şakiro negihîştîye wî.

Wexta ku em li kevneşopiya dengbêjiyê dinêrin em dibînin ku kevneşopî bi temamî bi devkî berdewam dike, bi giştî têkiliya hînkêr-hînber heye, varyantên heman çîrokan li cihên cuda çêdibe, ji ber ku di dengbêjiyê de dengbêj mehlesa xwe naxin nav kilaman berhem bi hêsanî dibin anonîm (Kardaş, 2012). Ev îfade ji bo dengbêjiya Şakiro jî gotineke rast e. Şakiro wek her dengbêjî ji dengbêjên din ders girtiye; hin varyantên çîrokan an jî yên kilaman wek ku guhdarî kiriye gotiye, hinekên wan li gorî gotin û awaza xwe guhartiye. Eger em bi çavê dengbêjiyê lê binihêrin, camêro dengbêj e. Dîsa heke em bi çavê şairiyê lê binêrin, mêriko şair e (Yıldız & Taşkın, 2018). Şakiro her çiqas kilamên Evdal, yên Reso, yên anonîm gotibe jî kilamên wî bi xwe jî hene lê li gorî keresteyên di destê me de em dizanin ku hejmara wan kême e. Her çiqas gelek kilamên dengbêjiyê bûne anonîm jî, em dizanin ku kaniya kilamên ku Şakiro gotine Evdalê Zeynikê û herêma Serhedê ye.

Em bêguman dikarin bibêjin her ku navekî wek Şahê Dengbêjan hatiye lêkirin, Şakiro dengbêjê herî mezin ê Kurdan ê sedsala bîstemîn e. Di hostadiya Şakiro de tenê xweşiya deng tune; bi newaya xwe, bi stîla xwe ya xweser, bi gotin û şiroveya xwe ya xweş wî regekî nû tev li ekola vê kevneşopiyê kiriye. Şakiro ne ew dengbêj bû ku tenê di nav Kurdên bakur de dihat naskirin, ew li deverên ku ‘kurdîaxêv’ lê hebûn ‘delalê ber dilan’ bû. Bi taybetî di nav Kurdên rojhilat(Îran)ê de Şakiro hem efsaneyek bû, hem faktoreke girîng bû ku jiyana wan cudatir dikir. Ji Urmiyeyê bigire heta Senendec, heta Mehabad û heta Kirmanşahê bi taybetî li cihên gundewar li gel çend goranbêjên Soran mirov bi dengê Şakiro radibin û rûdiniştin (Kevirbirî, 2009). Gelê herêma Serhedê çawan bi kilamên wî radibin û rûdiniştin wisa jî, Xerzan, Botan û Torê jî bi dilekî xweş lê guhdarî dikirin (Yıldız & Taşkın, 2018). Helbet di belavbûna dengê

Şakiro de bandora derketina teyban zêde bi zêde çêbûye. Bi tomarbûna kilamên wî yên kasetên teyban re awaza wî li cograyayên cuda her çûye belav bûye û îro gihiştiye vê astê. Şakiro bêguman bi kurmanciya xwe neteweyî, bi hunera xwe bûye kesayetekî gerdûnî.

Şakiro wexta ku sê sal dimîne ku bigihîje rehma Xwedê, barî Îzmîrê dike. Mîna gelek dengbêjan ew jî di nav feqiriyêke mezin de, di 65 saliya xwe de, di sala 1996'ê de li Îzmîrê li gorî hinek lêkolîneran ji ber nexweşiya mîdeya xwe, li gorî hinek çavkaniyan ji ber nexweşiya gurçika xwe wefat kiriye.

II. TEHLÎLA ÎDEALÎZASYONA JINÊ

Di vê beşê de her wekî ku me di beşa destpêkê de jî diyar kiribû, em ê li ser kilamên ku Şakiro gotine bisekinin. Mebest ji “kilamên ku Şakiro gotine” ne ew e ku tenê kilamên ku Şakiro afirandine. -Her wekî ku me li jor jî diyar kiribû- ji ber ku gelek kilamên dengbêjiyê bûne anonîm, Şakiro her kîjan kilam gotibe em ê bi navê “kilamên ku Şakiro gotine” nav bikin. Li gel vê daxwazê belkî em bikaribin profileke giştî ya li ser vê mijarê jî bi dest bixin.

Ji ber ku di dengbêjiyê de dengbêj mehlesa xwe naxin nav kilaman berhem bi hêsanî dibin anonîm; em qenaet dikin ku ji ber ku li gorî cûreya vebêjeyê îfadeyên qalibgirtî dihewîne, kevneşopiya dengbêjiyê divê bi temamî bikeve nav berhemên folklorîk û herwiha were nirxandin (Kardaş, 2012). Bi rastî di nav berhemên ku hatine gotin de, wek kilamên ku bûne anonîm gelek îfadeyên hevpar jî di kilamên cuda cuda de derketine pêş me. Bi giştî wesfên ku ji bo jinên di nav kilaman de hatine kirin, gelek caran dişibin hev. Em ê di vê beşê de li ser van îfadeyan bisekinin. Ji bo vê beşê em li ser 107 kilamên ku Dengbêj Şakiro gotine hûr bûn. Ji bo nivîsîna kilaman me wek çavkanî pirtûka Antolojiya Dengbêjan-2 Dengbêj Şakiro (nivîskar: Ömer Güneş-İbrahim Şahin) ji xwe re kir çavkaniya yekser. Helbet di nav kilaman de mînak bêhesab hebûn lê me ji bo her forma îfadeyan 6 mînak ji beşên kilaman piştî şiroveyan danî nav vê xebatê.

Di benda a'yê de em ê hewl bidin hîn bibin ku teswîra ku bi îfadeyên şênber ya li ser jinan hatiye kirin di kilaman de bi çi rengî ye. Jin, bi tiştên xûyayî çawa ketine nav kilaman; em ê li vê bersivê bigerin. Di vê beşê de du binbeşên me hene: yek, jin-li gel bedena xwe; du, jin-li gel kinc, amûr, tiştên din. Çav, rû, dev, dêm, lêv, tilî û pêçî, tûncik, çepil, por, nav, sîng, bejn û bal... bi giştî bi çi rengî derketiye pêş me; em ê di binbeşa pêşîn de li ser wesfên oraganan bisekinin. Di binbeşa duyem de em ê li ser kinc û amûran bisekinin. Kofi, timtêl, laçik, kember, zêr... ; ango tiştên ku jin li xwe dikin çi ne; elb, destmal... ; çi di destê wan de ye; em ê li ser van formên qalibgirtî rawestin.

Di benda b'yê de em ê hewl bidin hîn bibin ku teswîra ku bi îfadeyên razber ya li ser jinan hatiye kirin di kilaman de bi çi rengî ye. Di vê bendê de tiştên nexûyayî wê hebin. Ev bend bi du binbeşan ava bûye: yek, jin-li gel karakterê xwe; du, jin-li gel tevgera xwe. Nezanî, xeydokî, xeberxweşî, delalî... ; ev bi karakter ve hatine girêdan û formên van di binbeşa pêşîn de ne. Meş, çûyîna kaniyê, sekinîna li cihekê...; ev tişt di bin sernavê binbeşa duyem a benda b.yê de hatine berhevkirin.

Di benda c'yê de em dixwazin nîşan bidin ku teswîra jinê ji xêynê benda a û ya b'yê çawa ye. Mînak, di gelek kilaman de îfadeyên wekî “ez te nadim mal û milkê temelê dunyalikê” derbas dibe. Gazîkirin, feryad, êşa dengbêj ji bo jinê, dermanê wî, sond û qesema wî, daxwaza wî çi ye; em ê di vir de li ser wan îfadeyan hûr bibin.

Di tabloyê de formên sereke yên kilamên Şakiro hene.

FORMÊN SEREKE YÊN KILAMÊN ŞAKIRO

BI NIHÊRÎNA XÛYAYÎ VE		BI NIHÊRÎNA TIŞTÊN NEXÛYAYÎ VE		BI NIHÊRÎNÊN DIN VE	
BEDEN	KINC, AMÛR	KARAKTER	TEVGER	ŞIBANDINA AJALAN	UNSURÊN DIN
ÇAV	KOFÎ	NEZAN	MILMILÎN	KEW	NÎDA
BIRÛ	TIMTÊL	XEBERXWEŞ	XEMILÎN	XEZAL	DERDÊ EVÎNÊ
BEJN	MÊZER	NAZIK Û NAZENÎN	ÇÛYÎNA AVÊ	QAZ	MALXIRABÎ
ÇEPIL	LAÇIK	XEYDOKÎ		BERX	BIRÎN-DERMAN
TÛNCIK	KEMBER	BÊQEWLÎ, BÊQIRARÎ		KEHÊL	EZ BÛM AŞIQÊ...
POR	XIZÊM				SSOND
NAV	GUHAR				MÊRÊ KOTÎ
DÊM	ELB				BERMALÎ
SÎNG	DESMAL				ZANÎNA NAV
BIÇÛKÎ					FESADÎ
TILÎ Û PÊÇÎ					BÎNBAŞÎ
DEV					MEM Û ZÎN
LÊV					REVANDIN
GERDEN					
ZEND					
GULÎ					
ENÎ					
SÛRET					
POZ					
DIRAN					

a.Di Kilamên Şakiro De Jin Bi Nihêrîna Xûyayî Ve

i. Jin-Li Gel Bedena Xwe

Evîna evîndar di kilamê de bi çavên xwe yên nazik û yên reş ve gelek caran derdikeve pêş. Çavên belek, ew organ in ku dengbêj birîndar dikin, wî evîndartirîn dikin lê dîsa jî dengbêj naxwaze bêyî wan bibe. Dengbêj tenê bi bedewiya çav namîne; ew çavên ku dengbêj dibe aşiq bi ser de tim di dengbêjiya Şakiro de bi kil in, bi surme ne jî. Ew bi kilê sibhangolê tên reşkildanê. Ji bo wan çavan eşîr ji hev belav dibin, ew bela ne. Çav, carinan di kilaman de bi awiran ve jî derdikevin pêş. Ew, ji bo axaftinê bahane ne. Daxwaziya dengbêj jî derdikeve pêş hey caran: "...Sebra dilê mi, mi ji te ra nego subhangolê meke belek çava/ez bextê te û Xwedê ketime sed yazixa ax lo çavê te ye..."

"... mi dî yeka bejnzirav e, çavbikil e, biskbitêl e..." (Kilama Wey Dil)

*"... sebrê tu nizanî xelk bû aşiqê mal û hal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqê bejna zirav, çav û buryê reş û reşbelek..."*

(Kilama Esmera'm Were)

"Delîl yadê sibe bû çavê reş û belek lê çavê te ne

...

çavê reş û belek lê bi surme ne

jor da rîşê şarê berdabû ser burîkê lê di çatme ne..."

(Kilama Delîl Yadê)

*"... berxa dilê mi tu bala xwe bidê gelo eşîra mala bavê mi gelek e
tirsim îro çendê tamam bêtifaqî ketiye navê
ji bona belek çava hoy hoy lo ji hev bela be..."*

(Kilama Dilê Rezîl Ketiye Dikim Nakim Çare Nabe)

*"... ez ê qasekî werim rûnê li odeka we ya misafîra li nava mêvana
tu bi awirê çava, bi qinyata dila, bi îşaretê desta bang mi bike
ez ê qasekî werim li alîkî malê destê xwe bavê nava reş guliya..."*

(Kilama Ez Ê Delalîka Xwe Ji Malê Derketin)

*"... ez ê bi harisê bejna zirav dêmî gulî
çav û buriyê reş û belek belekê çavan im*

...

ez xirab im ez xirab im

di kaviliyê gunda da dikim nakim bê çavê reş û belek nabim..."

(Kilama Keçkê Dînê Ez Nezan Im)

Birû di kilaman de wek forma “çav û buryê reş belek” piştî çavan tê gotin. Ew jî mîna çavan reş in, belek in. Ne qalind in, ne stûr in; tenik in, ziravok in. Ji jor va rîşê şarê tê li ser birûyên çatme. Bûrî ji aliyê tenikayiya xwe ve mîna têla qeytan e. Seba xatirê çav û birûyê reş û belek di dêrisê gundan de bîst û çar eşîr dikevin dawê.

“... çavê xwe reş kildane
buryê tenik i fenanî têla qeytan e...” (Kilama Eyşa Îbê)

“... gelî gundî cînarno çavê xwe reş kirin ji kildanê
buriyê te tenik in fenanî têla qeytanê...” (Kilama Êmê)

“ay felekê hê mala e xira be
ezê ji bona çav û buriyê belek malxirabo nexweş im ez dimirim
tu dêhna xwe bidê ji êvara Xwedê da çûme berf e nayê...”
(Kilama Esmer Wele Nabe)

“... ax delaliyê sibe ye mi ji te ra nego bi rê da ha bi rê da
tu rabe çava bişkêne buriya pêda pêda...” (Kilama Herê Lê Delaliyê)

“... êl bû bi harisê mal û hal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqê bejna zirav, çav û buryê reş û belek
tim û tim cara jê gul dibarî
hey narîn ê hey narî narîn...” (Kilama Kewê Kubarê)

“Te çavreşê hê wê wê... lê birûgirê
te singspiyê gelo belkiya berfa çiyayê vê Qonxirê...”
(Kilama Te Çavreşê Birûgirê)

Bejn, bi ziraviya xwe ve, bi tenikiya xwe ve xwe di kilaman de dide nîşan. Dîsa bi teşbîhan bejn tê li ber çavan. Dengbêj ji ber nazikiyê bi giştî bi kulîlkan re, bi taybetî bi rihanê re bejnê berawird dike. Bejn wek şitil û tayê rihana li dev geliyan, wek tayê gulê, wek têla ketê, wek têla sulungê, wek têla xerdelê zirav e. Ji qamîşê dev golê, ji dara tûyînê, ji dara darê, ji topa rimê ziravtir e ew, ew gulabîn e. Di hin kilaman de bejn ji tilta dara biyê ye, ji têla kerengzer e, ji dara çamê ye. Bejn, tu yê bibêjî qey fenanî rihana biharê ye ku derketiye li ber belekian. Şakiro zêde zêde îfadeyên wek “bejn, bisk, çepil...”, “bejn, por, nav...” li dû hev rêz dike. Ev wek formekê bi gelemperî ji bo pesndayîna jinan derbas dibe. Li gel vê, îfadeya qalib a “ne tenê ev bedew e; ev jî, ev jî, ev jî bedew e” ava dibe. Taybetiyeke din a bejnê jî ev e ku bejn ne dirêj e ne jî kin e. Ango bilindiya jinê bi giştî bilindiyeke normal e. Di hin kilaman de hatiye gotin ku “şam û qutniyê Helebê li bejna xwe kiriye...” Jinan tiştên ku li bejnê, li qed û qametê şîrîn werin li xwe kirine.

“...Erê bejna zirav digo kuro delalîko sibe ye vê sibengê...”
(Kilama Keçkê Dînê Ez Nezan Im)

“Bê gewrê zalimê bejna te zirav e ji tayê rihanê ji têla ketê...”
(Kilama Gewrê Zalimê)

“...Qaza min qazîn e
yeke bejnzirav e,
çepildirêj e, porkej e, navqendîl e
gerdene zirav e jê di êlî ne
lêve tenik e kaxitî de
diranê hûr e mircanî ne
zaravê şîrîn e xeberdane şekirî ne
zimanê tûdî ne, pozê piçûke pîjîn e
sûrete sor e sosinî ne
tu dêhna xwe bidê xalxalî ne
vê sibengê çavê reş kildayî ne
biryê tenik û qeytanî ne
natikê fire ne çartilî ne...” (Kilama Lê Lê Qazê)

“... Lo lo kuro kulmalo gelo bejna mi di kaviliyê gunda da
ji te ra ne kin e ax lo lo li mino ax lo ne dirêj e
fena tak rihana li dev geliya, ber zinara
tu bala xwe bidê gul û bi Rebî şax davêje...”
(Kilama Berdilkê Dilê Min)

“... Têliya mi yeka bejnzirav e, çavbikil e, biskbitêl e,
çepildirêj e, porkej e, navqendîl e
gerdena zirav e jê di êlî
ax zalimê kilê subhanê ji belekçava neke xalî...” (Kilama Têlî)

“... lo lo kuro êtîmo di dêrisê gunda da bejna mi ne kin û le hû lo ne
dirêj e
bona eşqa dilê rezîl ez ê nexweş im malxirabo minê ji Xwedê rica kiriye
Xaliq Rebî minê ji Xwedê rica kiriye tu dêhna xwe bidê
fenanî tak rihana li dev geliya ber zinara hû yû lê şax davêje...”
(Kilama Mirin Hebî Kalbûn Qe Tunebî)

Çepil ango mil dirêj e. Forma ku çepil tê de derbas dibe bi giştî wiha ye:
bejn+çav+bisk+çepil+por+nav+gerden. Çepil fenanî dîregê du konan dirêj e.

*“ezê ji Dêrsîma jêrîn diçûme Dêrsîma jorîn
mi dî sê zerî li serê rêka mi rûniştini
yeke Kurmanc e yeke Ecem e yeke jê di Tirk e
mi dî yeka bejnzirav e, çavbikil e, biskbitêl e
çepildirêj e, porkej e, navqendîl e, gerdencer e...”* (Kilama Wey Dil)

*“...çepile dirêj e fenanî dîregê du konanê
Xwedê Rebîko ji xwe ra bavêje devê newala Moxanê...”* (Kilama Êmê)

*“... tu nizanî ez xezal im xezala egît im
gerdena mi zer e, çepilê min dirêj e...”* (Kilama Nêçîrvano)

Tûncîka yarê narincî ye, rengê wê pirteqalî ye. Tûncîk narîn e. Carinan yazme, laçîk tê li ser tûncîkê. Keçîk tûncîkê şe dike. Tûncîka narincî li ser natîka kever belav dibe, tij bi tij dibe. Dengbêj dixwaze ku yara wî wê tûncîka narincî qasekî biavêje li ber bendê kitanê, biavêje li rex simbelên wî daku tûncîk li ser wan belav bibe. Dixwaze tûncîka narincî berde li ser sûretê sor ê sosinî.

*“... hela rabe vê sibengê şe û şe biskê di şe, tûncîka narincî
bi ser sûretê sorê sosinî da berde ax dîlbîlmezê lo kin û dirêj e...”*
(Kilama Dîlbîlmezê Mi Çi Go)

*“... bexê tu sêr bike tûncîka narincî
li ser natîka kever wa belav bû bê Rebiyyo tij bi tij bû...”*
(Kilama Babîkê)

*“xelk bû aşîqê mal û hal û temelê dunyalîkê
ez bûm aşîqê dev û lêvê şekirî, tûncîka bi yazme ye...”*
(Kilama Lo Yeman Ez Fîrar Im)

*“Esmera mi sekinî li banê qesrê li ber pencerê gelo tûncîk şekir
vê sibengê destê xwe hejandî mendîl li ba kir...”* (Kilama Esmerê)

*“... mi dî şîrîna mi ji xwe ra ji malê derket
berxê bejna zirav da şîtavê, tûncîka narîn ji xwe ra şekir
qolê zêra ji kêfê ra gelo vê sibengê dabû ber kofiyê hey lûr...”*
(Kilama Hey Lûr)

*“... qasekî tûncika narincî bavê ber bendê vê kitanê
ji derdê dilê rezîl ra emê çend rojeka ji xwe ra bidin rexê vê simbêlê*

...

*şê û şê biskê di şê tûncika narincî ji êvar da
li ser eniya kever, dev û lêvê şekirî
gelî gundî cînarno ji kêfê ra belav bûne...”*

(Kilama Navê Te Xatûn E)

Por kej e, qehweyî ye, zehf dirêj e. Narîn e. Por mîna pûrta teyrê tawis e. Di kilaman de ku serî şûştî be por jî şil e. Dengbêj dixwaze ku por bê şekirin.

*“...porê serê Êmam dirêj e fenanî şirîte konê Zor Temir Paşa Mîrê Milî
tu vegirtî li rasta Heranê...”* (Kilama Êmê)

*“... der û cînar û malî dibê kuro kewa te ya gozel bi çi rengî bû
ezê bêm yeka çepildirêj e, kofikêl e, bejnzirav e
malxirabê porkêj e, sebrê lo pornarîn e...”*

(Kilama Te Çavreşê Birûgirê)

*“... tu bala xwe bidê kubara şîrîn ji gavê din da ji Birca Belek deketiye
bi ordama qazê, bi meşya quling, ji xwe ra dimeşe wa dimilmile
heware me Xwedê serê şûştî, porî şilê
gidyanê kûzê li desta, cêrê li mil e...”* (Kilama Dîlberê Serê Mi Diêşe)

*“Dîlber ca rabe porê xwe şe ke
gelo vê sibengê qatê qumaşê Helebê li xwe ke...”*

(Kilama Dîlber Meraqê Min)

*“... malxirabê ezê bûm harisê bejna zirav
porê serê Sosin fenanî pûrta teyrê tawis...”* (Kilama Sosin Û Ferzê-I)

*“... Dunyalikê danîme bejnzirava, çavbikila, biskbitêla,
çepildirêja, porkeja, navqendîla, malxirabo, gerdenzera...”*

(Kilama Eyşa Îbê)

Nav qendîl e. Binê qendîlan qalind in, nava wan jî zirav in. Şakiro xwestiye ku bibêje nava jinikê weke qendîlê zirav e, ewqas bedew e (Polat, 2020). Şakiro forma “navqendîl” zehf bikar tîne. Navqendîl bi giştî bi forma “... e+navqendîl e+... e” derbas dibe. Di nav kilaman de em rastî formeke cudatir nehatin. Em dikarin bibêjin ku nav zêdetir bi qendîlê hatiye teswîrkirin. Hunera teşbîhê bi vî awayî hatiye derdikeve pêş me.

*“... esmerê xelk bû aşiqê hal û mal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqê te bejnziravê, çepildirêjê
porkejê, navqendilê, sebrê lo kofixwarê...”*

(Kilama Ez Xezal Im Xirabmal Im)

*“... yeke bejnzirav e,
çepildirêj e, porkej e, navqendil e...”* (Kilama Lê Lê Qazê)

*“tu nizanî ez xezal im xezala egît im
gerdena mi zer e, çepilê mi dirêj e
porê mi kej e, nava mi bi qendil e...”* (Kilama Nêçîrvano)

*“... mi dî yeka bejnzirav e
çavbikil e, biskbitêl e
çepildirêj e, pokej e
navqendil e, gerdenzer e...”* (Kilama Medet)

*“... emro sibe ye qîz û bûkê gundê me meşyane avê
bejnzirava, çepildirêja, porkeja, navqendila xwe dane pêşiyê...”*
(Kilama Emro)

Wekî ku Şakiro forma “bejn, por, nav”ê bikar tîne, bi heman awayî forma “yanax, terz, şeml”ê jî bikar tîne. Yanax, peyveke Tirkî ye ku ji peyva “yanak”ê tê û wateya wê dêm e. Şakiro di dewsa yanaxê de peyva dêm jî bikar tîne. Yanax an jî dêm, ehmedî ne; terz, hakimî ye; şeml, Erebi ye. Bi giştî van rêzan dengbêj lêdike û bi dû re dibêje “lê kerem ke.” Dêm bi îfadeya Şakiro gulî ne, ew dişibin gulan, mîna gulan sor in.

*“... kewê kubarê xelq bû aşiqê mal û hal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqê bejna zirav dêmê gulî
yanaxê ahmedî, terzê di hakimî, şemlê di Erebi...”*

(Kilama Can Hey Can-I)

*“Ez evdalê Xwedê bûm aşiqê bejna zirav, timtêla xerîb, dev û lêvê
şekirî
tu sêr bike li zimanê tûdî, kofîka şeng, çepilê dirêj, girêdanê
wey Xwedê Rebiyo tu dêhna xwe bidê vê sibengê
heft salê me tamam bû minê ramîsanekî li dev û lêvê şekirî
yanaxê ehmedî, terzê di hakimî, şemlê di Erebi
tu sêr bike lê kerem kir...”* (Kilama Gula Mi Fenanî Kehêla)

*“ez ê bi bextê te û Xwedê ketime
tuyê ramûsanekî li dev û lêvê şekirî, li yanaxê ehmedî,
terzê di hakimî, şemlê di Erebi li mi kerem kî sebrê paşê herî...”*
(Kilama Lo Yeman Ez Fîrar Im)

*“... gelo vê sibengê minê destê xwe avêtî nava reşguliya
bi ser xwe da tewandî dikim ramûsanekî li dêmê gulî,
yanaxê ehmedî, li terzê di hakimî, şemlê di Erebi lê kerem kim...”*
(Kilama Wey Dil)

*“... êtîmo tu rabe ramûsanekî li taxima sing û berê mi kerem ke
minê taxima sing û berê xwe keçikê
bejna zirav, dev û lêvê şekirî, yanaxê ehmedî, terzê di hakimî,
şemlê di Erebi qurbana dev û lêvê teyê şekirî kir
na wele bejna te ya naziko bi cindî kir...”* (Kilama Xewên Şevê)

*“... heger şifqet ketiye dilê te da te bang mi kiriye
ramûsanekî ezê kerem bikim li dev û lêvê şekirî,
li yanaxê ehmedî, terzê di hakimî, şemlê di Erebi,
dev û lêvê şekirî, na welle nava zerbistana nîşan û xala...”*
(Kilama Dîlber Hela Rabe)

Bi giştî di dengbêjiya Kurdî de, bi taybetî di dengbêjiya Şakiro de zêde zêde îfadeya “cotê zermemikan” derbas dibe. Di hin kilaman de ew zer in, di hinekan de qerqaş in, spî ne. Ew bi xal û bi deq in, nûhildayî ne. Dengbêjan sîngên jinan di kilaman de teswîr kirine; gelek caran ew şibandine tiştên xwarinê yên wekî sêvan, xurmeyan, kulîlkan, hinaran, tiriyan, hêjîran, hinaran, porteqalan, êmîşan, mewîjan... Waxtê ku ev şibandin hatiye kirin, fêkiyên herî navdar ên bajaran hatine bijartin. Mînak, ji ber ku sêvên Xelat û Artemêtê navdar in, behsa wan hatine kirin. Ew kaxit û defter in, li ser wan deynê dewletê tînen nivîsîn, adres tînen nivîsîn. Ew cadde û meydana hespê lawikan in, li wê meydana sorgulên sor û kulîlkên sor û zer hêşîn dibin. Ew, belekiya berfa çiyayên cûr bi cûr in. Ew ê ku serê wan sor, binê wan spî fenanî fincanên feyfûrî ne. Li gorî dengbêjan memikên jinên ku hatine teswîrkirin ne organên biçûk in; ew, dîsa bi rêya teşbîhê bi gelek hêmanên xwezayî re hatine şibandin. Jinan jî behsa wan kirine, carinan kilît li wan dane ji bo hezkiriyê xwe. Tenê xwastine ku hezkiriyê wan derê wan veke. Lê sed yazix ku bi giştî sîng û berê jinikê dikeve qar û bêqarê kotiyê mêran.

*“mi destê xwe dabû nava taxima sing û berê muhuba dilê xwe bi tenê
fenanî sêvê Artemêtê, tiriye şewitiya Têrsûsê,
hêjîrê kaviliya Edenê, henarê Bêlecûkê, poteqalê Dortyolê
gelî gundî cînarno na wele vê sibengê malxirabo
fenanî gul û sosinê xasbaxçê Ataturk da ji xwe ra li mi bîn da wî he wî
wî...”*
(Kilama Kuro)

“... tu nizanî kotî miskînê heramî mêrê mi şeytan e
dêrisê gunda da xeberdar neke
ezê kilîta cotê zermemika teslîmê te bikim tu di cêba xwe ke
rojê careke bîhna te teng dibe hehû reben im derî veke...”

(Kilama Ca Rabe)

“...sala par vî çaxî taxima sing û berê Qaza Muxsî
ji mi ra alîkî deşt bû yek zozan e...” (Kilama Lê Lê Qazê)

“... hela tu rabe derva sar e vê sibengê malxirabo
were bikeve malxirabo kaviliyê xênî
di nav taxima sîng û berê min gulîbira Xwedê da ronî
taxima sîng û berê min keçikê ji te ra
tim û tim cara bikim bi sifre û berxo dîsa sênî...” (Kilama Ay Delal)

“... kuro lawiko gelo mi singê sor û zer ji te ra çêkiriye
îro ji xwe ra vê sibengê malxirabo spî dike fenanî baxçê lo sosin û
gula...” (Kilama Derdê Dila)

“... digo kuro delalîko tu were qasekî taxima sing û berê mi rebenê
ji te ra alîkî gul e yek sosin e bexê lo yek yayla ye
ez ji te ra sond bixwim malxirabo
alîkî bavê mala bavê mi sêv e yek rihan e lo tev xurme ye
hela bala xwe bidê ji gavê din da mi ji te ra nego
heya dunya xweş ava be am û alem tev bizanibin
taxima sing û berê mi meydana lo hespê te ye...”

(Kilama Ax Lo Min Lo Mi Têr Nedî)

“... ca tu rabî, gilî gazin û loma ji dilê min û xwu va neke
kilîta cotê zer memika teslîmê te bikim tu ji xwe ra di cêba xwe ke
rojê careke bîhna te teng dibe tu vê sibengê
kilîtê lêxe ji xwe ra derê cotê zer memika veke
heyânî mîla ber şefekê ji xwe ra pê şa be bike kêf û bi henek e
miskînî heramê mêrê mi şeytan e dêrisê gunda da xeberdar neke ax hay
alîkî singê mi ji te ra gul e, yek sosin e, yek çiçek e...”

(Kilama Derd û Mereqê Min)

“... gelo devê xwe li cotê memikê mi bigerîne
ez ji te ra sond bixwim fena sêvek ji sêvê Artemêtê
fena xurmekî xurmê di Bexdayê

na wele fenanî mewîjek ji mewîjê Bêslî gelo kejo bê dendiko...”
(Kilama Emrê Min-II)

Her çiqas bi giştî bejn û bala jinan dirêj be jî ew wek kesên biçûk hatine dîtin. Bêgûman ji biçûktiyê mebest narînbûna wan e. Li gorî dengbêjan jin zirav in, ji gotina peyva biçûk ew dixwazin bibêjin jin “ne qelew” in. Ew li gel bejnbilidiya xwe xwedî laşekî bedew in jî.

*“... xelk bû aşiqê mal û hal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqê bejna Subha Hacî
te piçûkê, te xişîmê, te narînê,
te nazikê, devlikenê, xeberxweşê, te xanimê...”*
(Kilama Delala Gimgimê-Subha Hacî)

*“... bê mal cînar lê Helîmcanê
wey la piçûkê lê palê lê pûlê serê mi bi heyran,
ter û canî genciya lê mi bi qurbanê...”* (Kilama Helîmcanê)

*“... kawê kubarê xelk bi harisê mal û hal û temelê dunyalikê
ez dimirim ji bona te piçûkê, te xişîmê, lê te bêrîvanê...”*
(Kilama Kubarcanê)

*“... de were piçûka mi were
nazika mi were, nazenîna mi were...”* (Kilama Lê Lê Qazê)

*“... ji dilê rezîl ra emê meşkin ser kaniyê
de destê xwe bidim desta
devê xwe bikim li xal û xeta gerdena te şîrînê,
te piçûkê, te xişîmê, te nezanê, te zeriye...”* (Kilama Yar Gidî Yar)

*“... îsal çend û salê me tamam bû
ezê ketime dû te keçikê te narînê te piçûkê te xişîmê wax lo te nezanê...”*
(Kilama Kewa Gozela Bilîcanê)

Tilî û pêçiyên keçikê “balmûmî” ne; ew wek findan, wek hubrê qeleman, wek qeleman zirav û dirêj in, nazik in. Gava ku tilî û pêçî bi qelemê re tîrî şibandin, daxwaziya nivîsîna gotinan diyar dibe. Hey caran bi van tilî û pêçiyên tiştên xwarinê ji evîndar re tê çêkirin. Tilî bi gustîl e, jinik dixwaze gustîla tiliya xwe derxe li tiliya yarê xwe bike. Dengbêj dixwaze ku bi van tilî û pêçiyên dermanê simbêla narincî çêbibe.

“... vê sibengê gelo bi tilî û bêçiyê balmûmî,
bi zenda badayî, bi şam û qutniyê Helebê
qasekî mendîla xwe ji mi ra ca li ba neke...” (Kilama Dîlber Meraqê Min)

“... min ê bigota keçê kulmalê tu were bi qasekî ji derdê dilê rezîl ra
rûnê
bi tilî bêçiyê balmûmî çêbike melhema ser bêçikê xwe
gelo vê sibengê dermanê vê simbêlê...” (Kilama Gula Şebo)

“... alîkî singê mi ji te ra bi kaxit e
tilî bêçiyê mi ji te ra bi qelem e
sazam xirabo zarê mi bi gotin û xeber e
taxima sîngûberê mi bi kaxit e
tilî bêçiyê mi bi qelem e tu dêhna xwe bidê
derdê dilê rezîl ra tu binivîse
ez ji te ra bibêjim ez sebra te me...” (Kilama Keçê Dînê Dewranê)

“... lawîko tilî û bêçiyê min ji te ra bi qelem e
zarê min bi gotin û xeber e
sing û berê min bi kaxit u defter e
tuyê katibekî ji dewleta malxirab rake
bira çend rojeka rûnê deyn û borcê dewletê binivîse
wêl xeyalo gelo adrêsa min û te va bide sere...”
(Kilama Sebeb-Xweş Diyarbekir)

“... ezê bejim lawkê mi hatibû mala me bi mîvanî
minê jê ra qawirmekî sacê çêkirî
bi tilî bêçikê balmûmî ber mîvanê mala bavê xwe da danî...”
(Kilama Hatiye Mala Bavê Mi Mîvaneke Pir Ezîz E)

“... Bê Dîlberê derê mala bavê Dîlbera hê hê lê mi bi quble da ax gidî
Dîlber
sed yazixa tilî bêçiyê balmûmî nebû îro derketiye banê qesrê
ji heramî mêrê xirav ra hê hê lê bulxur tevda û hê gidî Dîlber
sed yazixa tilî bêçiyê balmûmî nebû îro derketî banê qesrê
ji heramî mêrê xirav ra bulxur tevda...”
(Kilama Derê Xaniyê Mala Bavê Dîlbera Mi Du Qanat E)

Dev, bi giştî li gel lêvê tê. Forma “dev û lêvê şekirî” berbelav e. Dev mircan e, hûrhûrî ye. Ew jî wek lêvê tenik e. Dengbêj tim bi daxwaza ramûsanê dev tîne ziman.

“... dev û lêvê şekirî fenanî mircanê welatê jêrîn gelo lo hûrhûrî ne şam û qutniyê Helebê li bejna tenik û zirav lo dibe tîne...”
(Kilama Ez Ê Delalîkê Dilê Xwe)

“... berxa dilê mi ez ji te ra sond bixwim sonda qesemê henarê sûretê mi keçikê dev û lêvê tenik cotê zermemika tim û tim cara ji xêrî te milxirabo qismet û nesîbê kesî nîne ancax ji xwe ra bi qismetê lo canê te ye...” (Kilama Gula Silo)

“... hewar Xwedê gelo taxima sing û berê mi ji te ra bi kaxit û bi defter e dev û lêvê mi keçikê tenik e, bi mijûlî, bi qisedan û bi xeber e...”
(Kilama Misafiro Were)

“... ezê dev û lêvê şekirî vê sibengê malxirabê tamamî ji kêfê ra tev temaşe kim...” (Kilama Ezê Bi Gotina Te Kim)

“... îro bi şûn da ez evdalê Xwedê qîzan û bûka berdim bikevime gelo li ser şopa jinebiya tu dêhna xwe bidê li hêşya konê Erebî bejna zirav bigirim ramîsanekî kerem bikim li dev û lêvê şekirî lo li xala rûya.”
(Kilama Zozanê Bîngolê)

“... hela tu were ramîsanekî li dev û lêvê şekirî, li yanaxî ehmedî, terzê di hakimî, li mi kerem ke...”
(Kilama Ez Ê Bejna Zirav Îro Dimeşiyane Gera Biniya Mala)

Lêv ne stûr e; ew jî tenik e, şîrîn e, şekirî ye. Xizêmeke zêr û zîvîn a dor bi şirik ketiye li ser lêvan. Gelek caran ew bi kaxitê Îranê re, bi kaxitê destê katiban re hatine şibandin; dengbêj gotiyê lêvên keçikê ewqas tenik in. Dengbêj xwastiye ku jin dev û lêvên şekirî li simbêla sor a narincî bike.

“... gerdenê êlî fenanî gerdenê qazan e pozê piçûkê fena nikulê di kewan e lêvê tenik e fenanî kaxitê Îran e...” (Kilama Eysa Îbê)

*“... pozê te piçûk e fenanê nikulê di kewanê
diranê hûr e fenanî heba di mircanê
lêvê te tenik e fenanî kaxitê vê Îranê...” (Kilama Êmê)*

*“... bona dev û lêvê şekirî Xaliqo Rebiyo li gera biniya mala
tu dêhna xwe bidê hêsîr û û lo feqîr bûne...”
(Kilama Ez Ê Delalîkê Dilê Xwe)*

*“...dimrim dimrim dimrim...
berxê gidî dimrim bona bejna zirav dimrim
bira devê mi bi xal û xetê gerdena zer biketa
ramûsanek li dev û lêvê şekirî, li yanaxê ehmedî,
terzê di hakimî, şemlê di Erebi, xebxebkê ber guhara kerem bikim...”
(Kilama Dîlber Dimirim)*

*“... gerdena êlî fenanî gerdena qazayê
pozê piçûkî fenanî nikulê di kewayê
lêvê tenikî fenanî kaxitê destî kaxibayê...” (Kilama Têlî)*

*“... ezê bibûma xizêmeke zêr û zîvîn dor bi şirik
minê xwe jor da berda li ser şê û şê biskê di şê
dêmi gulî, yanaxê ehmedî, terzê di hakimî, şemle di Erebi,
xal û xetê di gerdenê
ê lo hoy lo ho lo ho lo hoy... lêv dirana...” (Kilama Gulê Dêranê)*

Rengê gerdenê zer e, qerqaş e, çîl e, gewr e. Em dikarin bibêjin herî zêde zer e. Di hin kilaman de gerden zirav e, bi xal û bi xet e. Dengbêj dixwaze ramûsanekê li xal û xetê gerdenê bide. Di hin kilaman de ew tê kitkirin; yara wî dibêje tu kit meke, bi diranên xwe lo tu reş meke. Li ser gerdena zer qolî zêran, zîv, morî, mircan, bişkok, sedef hene. Morî li gerdenê ye, keçik dixwaze ku wê moriyê biqetîne, bike tizbî, li destê yara xwe bike. Li jora gerdenê xebxebk heye, gelek caran xebxebk li ber guharan e. Gerden mîna gerdena qazan e, nazik e.

*“... ez ê rabim bejna zirav ji şitavê nizanim teze nînim berxo lo ji kî ra
kî ra
ez ê ji eşqa delalîkê dilê xwe ra bavêm gerdena zer
gerdena zêr û zîvîn na wele qolek ji qolê zêra...”
(Kilama Lo Lo Kuro Delalîko)*

“... minê di jor da xwe berda nava
helîm morî mircan û bişkokaan û sedefa
êtîmo tu were ramîsanekî li dev û lêvê şekirî
li xal û xetê gerdenê li mi kerem ke...”

(Kilama Hey La Hewilî Wey La Betilî)

“... hewar Xwedê vê sibengê malxirabo gava tu mi radimîsî
devê xwe bike xal û xetê gerdenê temiya mi li te be
gerdena mi piro çîlo pir qerqaşo, piro gewr e
gelî gundî cînarno vê sibengê tu kit meke
hewar Xwedê li ber diranê lo xwe reş meke...” (Kilama Dil Çetin E)

“... tu sêr bike malxirabê, xwûnşêrînê, gerdenzerê
...
gidîno gelo vê sibengê malxirabo xwe dabû ser şêmîgê sekinî, ca li
sivderê
sebrê tu dêhna xwe bidê avêtî gerdena zer qolî zêra
bi ser bejna tenik û zirav da berda şirikê vê kemerê
ez ê devê xwe bikim xal û xetê di gerdenê
eman ez dimirim nemrim bi wî kulê, bi wî derdî bi wî keserî...”
(Kilama Qemerê)

“... ez ê bêjim mala we xirav be
min ê ramîsanekî li xal û xetê gerdena Helîma xwe kerem kiriye...”
(Kilama Helîmcanê)

“... minê dêhna xwe berdayê ji eşqa dilê rezîl
delalîkê dilê mi dest avêtê helî morî mircanê gerdena zer qetiyabû
taxima sing û berê lo mi spî kir...” (Kilama Xewên Şevê)

“...gerdena te êlî fenanî gerdena qazanê...” (Kilama Êlê)

Zend, zerbadayî ye, zer e. Carinan dikeve bin serê evîndar; carinan dikeve bin serê zarokê, diqerime. Zend tenik e, nazik e, zendik lê ye. Zendik ji bişkokaan çêbûye, li ser zendê ye. Dengbêj zendê digire, zendik carinan diqete. Bazina zêr û zîvîn e li ser zenda zerbadayî. Li ser bazinên zêr û zîvîn hirî heye. Yara dengbêj a bi zenda zerbadayî kuliyek hiriya qerqaş a spî li dora zenda xwe badaye; bi teşîya mîşon a di destê xwe de wê hiriyê dîresîne, dirîse. Tenê hiriyê na, derd û kulê dunyayê jî pê re dibêje dirêse.

“... lawîkê mi raketiye ji derdê dilê rezîl ra mi qêmîş nekir
zenda min a zerbadayî binê serî da diqerimî...” (Kilama Xewên Şevê)

“... minê ji kerba dilê rezîl ji şabûna
dest avêtiye nava helî morî mircana van moriya
mi çi zanîbû zenda zer tenik e gelo bişkokê te qetiya...”
(Kilama Xewên Şevê)

“... tu sêr bikî dewlekî heramî pîsê vî namerdê peyda biye
ji êvarê heyânî mîla ber şeveqê
eman jê ra lûrî ax lo bexê dikim dibêm heylûr lûrî nabe
hela bala xwe bidê zenda min a zerbadayî bazinzîvîn
ji xwe ra diqerimî li ser dara hêlkanê...” (Kilama Êmê)

“...zenda zerbadayî ne
ser zenda da bazinê zêr û zîvîn e
li ser bazinê zêr û zîvîn kulî hiriye qerqaşê di spî ne
desta da teşîya di Mûşîne
derd û kulê dunyayê dibêje dîresîne...” (Kilama Lê Lê Qazê)

“... mi dî bejna zirav li ber dara spîndarê sekinî
gelî gundî cînarno desta da teşîya di mîşone
li ser zend spî kulî hiriya di qerqaş bû
derd û kulê dunyayê dibêje dirêse...” (Kilama Evdêl)

“... bira serê xwe bide ser cotê zendê minê zerbadayî
sûretê xwe bide ser cotê zermemikê minê nîşan û xal i...”
(Kilama Genc Xelîl)

Gulî, porê ku li piştê hatiye vehûnandin e. Şakiro ji bo por rengê kej, yê qehweyî; ji bo tûncikê rengê narincî; ji bo guliyê jî rengê reş layîq dîtiye. Gulî reş e, hûr e; gelek caran gulî ne yek in, ew cot in. Dengbêj dike ku destê xwe biavêje reşguliyan. Carinan sî û sê heb gulî hene, ew li ser bejna tenik û zirav bûne çît. Hey caran gulî ji bo axkirinê jî tê gotin, dengbêj forma “min gulîbira Xwedê” jî bikar tîne. Hey caran jinik jî ku ji evîndar hez bike li ber nakeve wan guliyên reş dibire, jêdike ji bo evîndarê xwe.

“... hela rabe em ê ji malê meşkîne hewlîkê vê sivderê
bira heramî mêrê te xwe bide li ser xênî
ez ê destê xwe bavêm nava reş guliya
tilî û bêçiyê xwe bavêm ber qaşa vê kemberê...” (Kilama Sebra Dila)

*“tu bala xwe bidê vê sibengê di dêrisê gunda da
tuyê yeka bejnzirav î, çavbikil î, bisbitêl î, çepildirêj î,
porkej î, navqendil î, gerdenzer î
tu dêhna xwe bidî ji bejna xwu va bilind î
tu xwedanê tîpek guliyê hûr î...”* (Kilama Keçê Kulmal)

*“... minê destê xwe avêtî nava reşguliya
bi ser xwe da tewandî dikim ramîsanekî li dev û lêvê şekirî,
li yanaxê ehmedî, li terzê di hakimî, şemlê di Erebi
xal û xetê di gerdenê xebxebkê ber guhara lê kerem kim
...
gelo vê sibengê minê destê xwe avêtî nava reşguliya...”*
(Kilama Wey Dil)

*“... ezê cote reş guliyê xwe jêkim
ji hespê pismamê xwe ra bikim doxhefsar î...”* (Kilama Genc Xelîl)

*“... tu nizanî ez xezal im xezal a egît im
gerdena mi zer e, çepilê mi dirêj e
porê mi kej e, nava mi bi qendîl e
zenda mi bi bazin e, tiliya mi bi gustîl e
lêva mi tenik e, pozê mi bi qerenfîl e
sî û sê gulî ser bejna min a tenik û zirav bûne çît...”*
(Kilama Nêçîrvano)

*“... ezê destê xwe bavêm nava reşguliya
devê xwe bikime xal û xetê gerdenê...”* (Kilama Qemerê)

Enî an jî natik kever e. Şakiro xwastiye bibêje ku eniya wê fireh e, ne eniyeke biçûk e (Polat, 2020). Natik bi qasî çar tiliyan e, tê têlkirin. Li ser natikê kofiya kêl heye, qolê zêran heye, ew qolê zêran sê cerge ye. Enî mîna zozanê jorîn kever e.

*“... ez ji te ra sond bixwim vê sibengê enya mi kever e fenanî zozanî di
jorîn e
hefsid malê Bêrtiya gelo ji xwe ra hatin lê danîne...”*
(Kilama Ez Gune Me)

*“... vê sibengê çavê reş kildayî ne
biryê tenik û qeytanî ne
natike fire ne çartilî ne
li serê Qaza mi kofî ne...”* (Kilama Lê Lê Qazê)

*“... tu sêr bike kawa mine kubara naziki nazenîn
bejna zirav girê dabû vê sibengê natika kever dabû ber qolê zêra...”*
(Kilama Kawê Kubarê)

*“... mi dî çavê reş û belek ji xwe ra reşbelek bû kir mane ye
sebra dilê mi qolê zêra dabû pêşiya eniya kever sê cerge ye...”*
(Kilama Lo Yeman Ez Fîrar Im)

*“... minê bejna xwe dabû şitavê
çavê xwe kil kiriye, natika xwe têt kiriye, biskê xwe hil kiriye...”*
(Kilama Emrê Min-III)

*“... fenanî cara xwe girêda li qayde ye
qolî zêra kutaye natka kever bi sê cerge ye...”* (Kilama Têlî)

Sûret an jî rû sor e, sosinî ye, bi xal e, xalxalî ye, nîşan li ser e, wek hinaran e. Ji ramûsanê sor bûye an jî sorikî ye. Şara reş tê li ser sûretê. Sûret ji ber sermayê zû diqelişe, nermik e, nazenîn e. Carinan hêsir li ser sûretê sor tê barandin. Carinan ne dengbêj, mêrê kotî ramîsanan ji sûretê sor distîne.

*“... çavê xwe reş kiriye ji kildanê
biskê xwe badane ji hildanê
sûretê xwe sor kiriye ji ramîsanê...”* (Kilama Emrê Min-III)

*“... sûretê sore sosinî ne
tu dêhna xwe bidê xalxalî ne...”* (Kilama Lê Lê Qazê)

*“ez evdalê Xwedê bûm aşiqê bejna zirav
dev û lêvê şekirî vê sibengê malxirabo sûretê sor ê sosinî
wey Xwedê Rebîno vê sibengê xulqê di şîrin e...”*
(Kilama Kubara Şîşman)

*“... ez ji te ra sond bixwim
ezê şara reş bi ser sûretê sor ê sosinî da berdim bidim bi pêşiyê...”*
(Kilama Zozanê Bîngolê)

*“... de lê lê hoy lê lê Xezalê wax ay
bejnziravê, çepildirêjê, porkejê, navqendîlê, rûbixalê...”*
(Kilama Nêçîrvano)

*“... tu bala xwe bidê gelo vê sibengê
hêsîra bi ser sûretê sor da dibarîne...”* (Kilama Medet)

Poz, bi biçûkiya xwe derdikeve li pêş me. Ew wek nikilê kewan hûr e, pîjîn e. Bi teşbîha qerenfîlê dikeve nav kilamê.

*“... pozê piçûkê fenanî nikilê di kewanê
diranê hûr i fenanî heba mircanê
lêvê tenik i fenanî kaxizê vê Îranê...”* (Kilama Emrê Min-III)

*“... gerdena te êlî fenanî gerdena qazanê
pozê te piçûk e fenanî nikulê di kewanê...”* (Kilama Êmê)

*“... porê mi kej e, nava mi bi qendîl e
zenda mi bi bazin e, tiliya mi bi gustîl e
lêva mi tenik e, pozê mi bi qerenfîl e...”* (Kilama Nêçîrvano)

*“... diranê mi hûr e fenanî mircan e
sêr bike pozê mi piçûk e fenanî pozê kewan e...”* (Kilama Qado)

*“... lê lê sebrê xelk bû aşiqê mal û hal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqê çav û buriyê reş û belek
pozê piçûk gelo vê sibengê gerdena zer cotê zer memika...”*
(Kilama Werî Mala)

*“... zarav e şîrîn e xeberdane şekirî ne
zimanê tûdî ne, pozê piçûke pîjîn e...”* (Kilama Lê Lê Qazê)

Diran bi hûriya xwe ketiye nav kilaman. Diran bi qasî liba mircanan e. Şirika xizêmê dikeve li ser diranan.

*“... diranê hûr i fenanî heba mircanê
lêvê tenik i fenanî kaxizê vê Îranê...”* (Kilama Emrê Min-III)

“... lêve tenik e kaxitî ne
diranê hûr e mircanî ne...” (Kilama Lê Lê Qazê)

“diranê hûr e fenanî heba di mircanê
lêvê te tenik e fenanî kaxitê vê Îranê...” (Kilama Êmê)

“... tu rabe lêvê mi tenik e fena kaxit e
diranê mi hûr e fenanî mircan e...” (Kilama Qado)

“... hela rabi qasekî şitavekî bidi bejna zirav dêmê gulî
mî çuqa jibîr kiriye bejna zirav gelo
bira ji jor dakeve lo ser dirana hoy oy...”
(Kilama Şitavek Bide Bejna Zirav)

“... minê gavê din da nizanîbû te ji kîjan xortê xelkê ra xwe xemiland
bi şêst û şeş awazî çêkiriye
şirika bêxwediya xizêmê ketiye ser lêvan û dirana...”
(Kilama Gewrê Zalimê)

ii. Jin-Li Gel Kinc, Amûr û Tiştên Din

Jinan berê kofî li serê xwe girê didan. Rêzek xeml pê ve dikirin, ew didan serê xwe (Polat, 2020). Di kilaman de kofî ango şar, bi kêl in, ehmedî ne, şeng in, carinan xwar li serî ne. Kofî, bi qolên zêran ên Mamûdî ve hatine xemilandin. Li ser kofîyan şar û şemaqiyên sor û zer hene, kofî li ser eniya kever tê şidandin. Dengbêj dibêje ku keçikê şar û şemaqiyê Diyarbekir li dora kofiyê lefandiye, reng bi reng e. Li ser egal û kofîyan şemlê Erebi ne, li ser çatmê birûyan neqîşandî ne. Kewa gozel a gogerçîn bi şêst û şeş awazan, bi heftê du terzan, bi donzdeh terzan xwe girê dide. Dengbêj di hin ristan de dixwaze hîn bibe ku jinikê kofîka şeng ji kê re daye dûzanê.

“... kawa min e kubar e nazik û nazenîn
tu rabe ji qarê dilê rezîl bejna zirav bide şitavê
qolê zêra bikute ber kofiyê...” (Kilama Yar Gidî Yar)

“... ez ê rabim destê kubara dilê xwe bigrim
qasekî ji zozana dakevim dêrisê gunda
berê xwe bidim kêleka dêreçita, mêzerhêşîna, laçikspiya,
kofîkêla, çepildirêja, bejnbilinda

ez ê ji eşqa dilê rezîl kêleka xwe bidim kêleka gewran û rinda...”
(Kilama Da Wayê Kubarê Emrê Çûyî Êdî Nayê)

*“esmerê xelk bû aşiqê hal û mal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqê te bejnziravê, çepildirêjê,
porkejê, navqendilê, sebrê lo kofixwarê...”*
(Kilama Ez Xezal Im Xirabmal Im)

*“... ezê vê sibengê bibêjim ji bona bejnzirava, çepildirêja, goguhara
na wele vê sibengê malxirabo kofikêla, gelo kofixwara...”*
(Kilama Min Birevîne)

*“... Êma mi teze rûniştiye bejna zirav da şitavê
qolê zira kutabû kofiyê vê cênîkê
ezê bi destê Êma xwe bigirim birevînim
bavê Dêrikê qeza Niftikê...”* (Kilama Êmê)

*“... kewa gozel cotê elbê toqatî avêtî zendê zerbadayî
ji malê derketiye gelo berê xwe dabû bêrikê ax lo berîvanê
mi dî qolê zêra ji derdê dilê rezîl ra kutabû ber kofiyê berxo lo li bin
kitanê...”*
(Kilama Gula Silo)

Timtêl, stîla lixwekirinê ye. Şakiro ji bo cil û bergan ev peyv aniye ziman (Polat, 2020). Timtêl di kilaman de wek tiştêkî “xerîb” tê dîtin. Timtêl xerîb e, giran e. Gava ku dengbêj keçikê nas nake dibêje min ew timtêla xerîb nas nekir. Timtêla kewa gozel ne ji girêdanên ji rêzê ye. Ew wek qîzên mareşalan girêdana xwe, timtêla xwe çêdikin.

*“... ez ê ji te ra sond bixwim gavê dinê
li orta her çar malê binya mala tu rastî mi hatî
mi tumtêla xerîb qe nas nekir...”* (Kilama Kewa Gozela Bilîcanê)

*“... minê destê xwe dabû desta, devê xwe kiribû xal û xetê di gerdenê
ramîsanekî li dêmê gulî, li yanaxî ehmedî, terzê di hakimî,
şemlê di Erebi, çav û buryê reş û belek, timtêla xerîb kerem kirî
...
go lawiko sibe bû vê sibengê ezê li timtêla te dinêrim
mêvan benzemîşê lawikê xwenê cindî dikim...”*

(Kilama Kubarcanê)

*“... lê lê sebrê xelk bû aşiqê mal û hal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqê çav û buryê reş û belek
pozê piçûk gelo vê sibengê gerdena zer cotê zermemika
na wele timtêla xerîb gidî gelo vê sibengê bejn û bala...”*

(Kilama Werî Mala)

*“... Zerî domamê xelk bû aşiqê mal û hal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqê bejna zirav, giradan û bexê vê timtêlê...”*

(Kilama Navê Te Xatûn E)

*“... ezê vê sibengê bi dengê elî bang te bikim li ber pencera û pacê
ji derdê dilê rezîl ra gelo ji bona dilê rezîl
tim tim û timtêla giran vî dilî, vê eşqê...”* (Kilama Emrê Min-II)

*“girêdan û timtêla kewa gozel fenanî qîza mişîrê Ezirganê
na wele fenanî qîza ji qîza Êl Melîkê vî welatî...”*

(Kilama Delal Gimgimê-Subha Hacî)

Mêzer, ew pêsmalk e ku berê jinan didan li ber xwe. Mêzer li ser kincan tên lixwekirin. Wek etekan e lê ne etek in. Ji etekan mezintir in, li ser etekan tên lixwekirin. Jin bi wan pêşiya xwe girê didin (Polat, 2020). Di kilaman de rengê mêzer carinan zer e, carinan hêşîn e, carinan spî ye. Mêzer ji çît e.

*“... qîz û bûkê me eşîrê tu dêhna xwe bidê vê sibengê bejnzirava
na wele dêrehêşîna, mêzerspiya xaliqo Rebyo tu dêhna xwe bidyê
mêzerçîta...”*

(Kilama Eysa Îbê)

*“... te navê min û xwu va nivîsiye avêtiye ser bendê vê mêzerê
mêzer şûştiye avêtî ser darê vê çeperê
bes e pişta xwe bide xênî, kêleka xwe bide caxê vê pencerê...”*

(Kilama Sebra Dila)

*“... li kêleka mêzerhêşîna, laçikspiya, kofîkêla, çepildirêja
na wele qîz û bûkê welatê Serhedê ji xwe ra xeberxweşa lo...”*

(Kilama Werî Mala)

*“... ezê rabim destê kubara dilê xwe bigrim
qasekî ji zozana dakevim dêrisê gunda
berê xwe bidim kêleka dêreçîta, mêzerhêşîna, laçikspiya...”*
(Kilama Da Wayê Kubarê Emrê Çû Êdî Nayê)

“... tu dêhna xwe bidê kofîkêla, çepildirêja, mêzerhêşîna, dêreçîta...”
(Kilama Xezala Li Palê)

*“... ezê rabim bi destê kubara şîrîn bigrim
ji kêfê ra bimeşime dêrisê gunda
li nava dêreçîta, mêzerhêşîna, kofîkêla, gerdenzera...”*
(Kilama Sebrê Welatê Me Nîne)

Laçik ew çît e ku jin didin serê xwe. Di kilaman de laçik zêdetir spî ye, carinan reng bi reng e. Li serê keçikê ye.

*“... qîz û bkê me eşîrê tu dêhna xwe bidê vê sibengê bejnzirava
na wele dêrehêşîna, mêzerspiya xaliqo Rebyo tu dêhna xwe bidyê
mêzerçîta
laçikspiya, gelo kofîkêla, heywax li min kitangewra...”*
(Kilama Eysa Îbê)

*“... ezê rabim destê kubara dilê xwe bigrim
qasekî ji zozana derkevîm dêrisê gunda
berê xwe bidim kêleka dêreçîta, mêzerhêşîna, laçikspiya...”*
(Kilama De Wayê Kubarê Emrê Çû Êdî Nayê)

*“... minê dêhna xwe dabû bejnzirava, çepildirêja
gelo vê sibengê li sûresêla
Xwedê Rebî gelo li kofîkêla, laçikdora lo rengbirenga...”*
(Kilama Gidî Lo Yeman Tu Ya Min Î)

Kember, li pişta jinikê ye. Kembereke xas e, bi qaş e, zîvîn e, zêrîn e, bi şirik e. Tê li bejna zirav, tê li navê, nava mîna qendîlê. Yara ku li ber şêmîka malê sekiniye bi ser bejna tenik û zirav de şirika kemberê berdaye. Kembera zîvîn gelekî li bejna zirav tê. Şirika kemberê jî heye. Zîv û zêrê li kemberê diteyîsin. Dengbêj dike ku pêçiyên xwe biavêje qaşa kemberê.

*“... ezê cotê reşguliye xwe jêkim
ji hespê pismamê xwe ra bikim doxhefsar i
xizêma pozê xwe bikim bizmar i
kembera pişta xwe bikim nal i
dema bikeve nav heval û hogirê xwe da*

*kes nebêje Genc Xelîl Kurmanc e
gidîno gelo Kurmancekî bêpergal i...*” (Kilama Genc Xelîl)

*“... Xwedê xira bike vê sibengê li serî şara zer e
li piştê xaskember e
tu dêhna xwe bidê şam û qutniyê Helebê
li bejna tenik û zirav wey Xwedêyo ji xwe ra bû qenter e...”*
(Kilama Esmer Wele Nabe)

*“... ezê vê sibengê malxirabo bejna xwe bixemilînim
şam û qutniyê Helebê
tu sêr bike qolê zêran û zîvan bavêm gerdena zer
malxirabo kembera zêr û zîvîn bidim bejna zirav
gelo vê sibengê li nava xwe hermetê...”* (Kilama Dilo Ha Yar Yar)

*“... Erê dewrê gelo sibe ye li me sura sibê bîna bê tê
gidîno kanî dûr e muhuba dilê mi ji avê tê
gerdena zer, qolî zêra, bejna zirav, kembera zîvîn çuqa lê tê
sebrê gidî şirikê kemberê li bejnê tê...”*
(Kilama Dilê Min Hêlîna Teyrê Sîmir E)

*“... gidîno te li piştê xas kember e
şam û qutniyê Helebê li bejna tenik û zirav hê hê bû qenter e...”*
(Kilama Esmera Şukrî)

*“... kembera piştê Zeyno bi zêr û zîv kim
di bin da zêrê qurs kim...”* (Kilama Kewê)

Xizêm ew xişir e ku bi taybetî jin dixin difina xwe. Ev xemla ku li rû tê xuyan di kilaman de cihê xwe girtiye. Xizêm di kilamên Şakiro de ji zêr e, zêrê zer e, ji zîv e, dora wê bi şirik e, bi hatiye kildanê. Bayê kur, bayê şerq, bayê xerb, bayê çep û rast dema ku li xizêmê dixwe ew vedigere, dizivire. Xizêm gelek zirav e, ji lêv teniktir e. Navê dengbêj û yara wî li ser e. Jin bi xizêm e. Dengbêj dixwaze xizêm were heta li ser dev û lêvan.

*“... kubarê ez ê bi te kim tu Rebî dihebînî
tuyê şirikê bêxwediya xizêmê berdî ser lêvan û dirana
ez ê qasekî werim rûnê li odeka we ya misafira li nava mîvana...”*
(Kilama Ez Ê Delalîka Xwe Ji Malê Derketin)

“... minê li gavê din da nizanibû te ji kîjan xortê xelkê ra xwe xemiland
bi şêst û şeş awazî çêkiriye
şirika bêxwediya xizêmê ketiye ser lêvan û dirana
ji eşqa dilê gewra mi vê sibengê gurîn ketiye ewran û ezmana...”
(Kilama Gewrê Zalimê)

“... tu bala xwe bidê
xizêma pozê Seraya Mamed Axa zîvê zelal e bi zêr kildane
gelî gundî û cînarno bayê kur û bayê şerq û bayê xerb e çep û rast
bîna bayê Bêlûbaşiyê lê dixê di poz da tere tê vedigere wa dizivire...”
(Kilama Seraya Mamed Axa)

“... gidîno gelo xizêm zêr e ji lêvê gidî teniktiro
wey Xwedêyo gelo lêv ji xizêmê gidîno pir zertiro...”
(Kilama Gorî Gorî Goriya Te Me)

“ezê bibûma xizêmeke zêr û zîvîn dor bi şirik
minê xwe jor da berda li ser şê û şê biskê di şê
demî gulî, yanaxê ehmedî, terzê di hakimî, şemlê di Erebi,
xal û xetê gerdenê...” (Kilama Gulê Dêranê)

“... eger Dêlêl li min nihêrî ji xwe nihêrî, gava ku nenihêrî
minê destê xwe li binê destê Delêl bixista
qasekî ji kedera dilê xwe yê bi kulê bi meraq ra
sêr bike bi şîrînî bi ezîzî bi xişîmî bi kubarî bi piçûkî
di binê zêr xizêmê ra lêva tenik û zirav ji Delêl ra têr bigezta Delêl...”
(Kilama Delêl)

Gohên jinan bi guhar in. Guhar tèn digihijin heta xebxebkê. Nîşan, xal li ber guharan hene.

“... minê destê xwe dabû, devê xwe kirî xal û xetê di gerdenê
binêre lo li sûretê rastê li bin guharê li nav nîşana lo li nav xala...”
(Kilama Ez Ê Kewa Gozel)

“... ezê vê sibengê bibêjim ji bona bejnzirava, çepildirêja, goguhara
na wele vê sibengê malxirabo kofîkêla, gelo kofîxwara...”
(Kilama Min Birevîne)

“... ez evdalê Xwedê rabim destê xwe bavê m nava dêmê gulî
devê xwe bikime xal û xetê di gerdenê
xebxebkê ber guhara, nişanê nav zerbistana...” (Kilama Dewran E)

“... bexê gidî dimrim bona bejna zirav dimrim
bira devê mi bi xal û xetê gerdena zer biketa
ramîsanek dev û lêvê şekirî, li yanaxê ehmedî,
terzê di hakimî, şemlê di Erebi, xebxebkê ber guhara kerem bikim...”
(Kilama Dîlber Dimirim)

Di destê jinikê de cotek elb heye. Forma “elbê toqatî” zêde derbas dibe. Jin ji bo doşandina pêz an jî waxtê çûyîna kaniyê vê bikar tînin; diavêjin milê xwe, bi çimbilê wê ve digirin diavêjin zendên zerbadayî. Seba xatirê lawikê xwe yê cindî ew cotên elbê toqatî diavêjin milên xwe diçin nav qîzan û bûkan, diçin bêrîvanê. Elbê wan darîn e.

“... lê sibe bû qiranê mala bavê mi pir giran bû, ser me da hatiye dana
ez ê rabim çotê elbê toqatî bavê me zendê zerbadayî
seb xatirê lawkê xwe yê cindî bikevim nava qîzan û bûka, bêrîvana...”
(Kilama Qedemşorê)

“... kawa min e kubar e nazik û nazenîn tu sêr bike
gavê din da cotek elbê toqatî avêtî zendê zerbadayî
berê xwe dabû bêrîkê bêrîvanê...” (Kilama Zera Mele)

“... minê bala xwe berdayê
cote elbê toqatî avêtî zendê zer badayî meşmeş kiriye ser kaniyê...”
(Kilama Ez û Kewa Gozel)

“şêxekî Senaniya kefikî sor bere dabû serê mine
bêmal teyê ez kirim derwêşkî rû dunya
elbaneke darîn daye destê mine
li bajara Diyarbekir temami gerandime hey lê...”
(Kilama Sebeb-Xweş Diyarbekir)

“... mi dî bejna zirav gelo derketiye pişta xwe dabû derik ji derê dîwanê
qîz û bûkê gundê me meşiyane bêrîkê bêrîvanê
kewa gozel jor da elbê toqatî avêtî zendê zer badayî...”
(Kilama Ax Lo Lo Min Lo Mi Têr Nedî)

“... ez evdala Xwedê ji derdê dilê xwe ra çûm bêriyê
minê elbê destê xwe danî nav heval û hogira...” (Kilama Eman Delalî)

Mendîl an jî destmal li ser destê jinê ye, di destê wê de ye. Desmal ji hevirmûş e, nerm e. Ew, mendîlê ji bo hezkiriyê xwe bi tilî û pêçiyên balmûmî, bi zenda zerbadayî, bi şam û qutniyê Helebê li ba dike.

“... ezê xwe bidimê zozanê jorîn, zozanê jêrîn ra
timî malxirabo mendîla ser destê xwe li ba kim...” (Kilama Gula Şebo)

“...ezê li banê qesrê bisekinim
tu were biniya mala me ra derbas be
ezê mendîla xwe ji te ra bihejînim ca li ba kim...” (Kilama Hey Lûr)

“... bira were qasekî li kêleka mi rûnê
bi desmala ser destê xwe ser çavê min bike bangê bawêşîne
ez ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê
nexweşê bêhal im vê sibengê malxirabê halê mi tunîne...”
(Kilama Dîlberê Serê Mi Diêşe)

“... gidîno tu dêhna xwe bidê hê bi desmala ser destê xwe
li ser çavê lawikê xwe bikim bangê bawêşîne...” (Kilama De Herê)

“... vê sibengê gelo bi tilî û bêçiyê balmûmî,
bi zenda zerbadayî, bi şam û qutniyê Helebê
qasekî mendîla xwe ji mi ra ca li ba neke...”
(Kilama Dîlber Meraqê Min)

“... malxirabê gelo vê sibengê mendîla li destê xwe
bi ser mi da ji xwe ra mehejîne, li ba meke...” (Kilama Emrê Min-I)

b.Di Kilamên Şakiro De Jin Bi Nihêrîna Tiştên Nexûyayî Ve

i. Jin-Li Gel Karakterê Xwe

Jinên ku dengbêj aşiqî wan bûne bi giştî nezan in, xişîm in ew. Bi qasî nîdaya “nezanê” nîdaya “xişîmê” jî heye.

“... *berxê sibê ye delaliyê dilê mi lawik i, biçûk e
xişîm e, nezan e fenanî mewîja kij a bê dendik e...*”

(Kilama Were Lawiko)

“... *îsal û çend salê me tamam bû
ezê ketime dû te keçîkê te narînê te piçûkê te xişîmê wax lo te nazenê...*”

(Kilama Kewa Gozela Bilîcanê)

“...*Te piçûkê, te xişîmê gelo vê sibengê malxirabê dîlbilmezê, lê te
nezanê...*”

(Kilama Bêrîvana Mala Mezin)

“... *tu dêhna xwe bidê malxirabo ez evdalê Xwedê
ketime tor û doza te nazîkê, te nazenînê, devlikenê, xeberxweşê
gelo vê sibengê na welle malxirabê, bê merhemetê, bê aqîlê, te
nezanê...*”

(Kilama Keçê Kulmal)

“... *ji dilê rezîl ra emê meşkin ser kaniyê
de destê xwe bidim desta
devê xwe bikim li xal û xeta gerdena te şîrînê,
te piçûkê, te xişîmê, te nezanê, te zeriye...*” (Kilama Yar Gidî Yar)

“... *ezê destê xwe bidim desta
devê xwe bikim xal û gerdena te xişîmê
te nezanê gelo xeberxweşê, rengesmerê...*” (Kilama Esmerê)

Ew, xeberxweş in; zimanê wan, zar û zaravê wan şîrîn e. Xeberdana wan weke şekiran e, devbiken in.

“... ez evdalê Xwedê dêrisê gunda da
bûm aşiqê te şêrînê xeberxweşê yar yar lo çavbelekê...”

(Kilama Ez Ê Kewa Gozel)

“... lê lê kawê kubarê sibe ye vê sibengê tu dêhna xwe bidê
ez ê bûm aşiqê te şêrînê, te xeberxweşê, gelo derdgirane...”

...

tu dêhna xwe bidê malxirabo ez evdalê Xwedê
ketime tor û doza te nazikê, te nazenînê, devlikenê, xeberxweşê...”

(Kilama Keçê Kulmal)

“... Bê bi rojê Êmê bi şevê Êmê saetê Êmê deqîqê Êmê
çarîkê Êmê gavê Êmê lahzê Êmê
te zarxweşê, bidevdostê, dlxayînê, biraqecerê...” (Kilama Êmê)

“... ezê destê xwe bidim desta
devê xwe bikim xal û gerdena te xişîmê
te nezanê gelo xeberxweşê, rengesmerê...” (Kilama Esmerê)

“... hela bala xwe bidê xelk bû aşiqê mal û hal û temel û temelê ax lo
dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqê te xeberxweşê, devlikenê
malxirabo bejnziravê, ne kinê ne dirêjê lo te kinikê...”

(Kilama Dêrika Ewranê)

“... xelk bû aşiqê mal û hal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqê bejna Subha Hacı
te piçûkê, te xişîmê, te narînê,

te nazikê, devlikenê, xeberxweşê, te xanimê...

(Kilama Delala Gimgimê-Subha Hacî)

Ew nazik û nazenîn in, xwînşîrîn in. Bedew in, kej in, delal in.

“... de were piçûka mi were

nazika mi were, nazenîna mi were...” (Kilama Lê Lê Qazê)

“Dîlber hela rabe kewa gozelê gogerçînê, nazike nazenîn...”

(Kilama Dîlber Hela Rabe)

“... kawê kubarê gelo vê sibengê tu çuqas şîrîn î

he hû reben ez im ewqasî tu delal î...” (Kilama Kubarcanê)

“... ez ji te ra sond bixwim, ezê bi te kim tuyê bi Xwedê kî

ramîsanekî ji dev û lêvê şekirî, ji yanaxî ehmedî,

terzê di hakimî ji Dîlbera nazin ez dixwazim...”

(Kilama Dîlber Dimirim)

“... qasekî herime pêşiya lawikê cindî

bira bêje sebra mine nazikê nazenîn jêliv tê...”

(Kilama Dilo Ha Yar Yar)

“... midî kubara min î şîrîn î, nazik e, nazenîn e

vê sibengê ji êvar da bi şêst û şeş terza dibêje

bi heftê awaza dilobîne...” (Kilama Medet)

Jin xeydok in, zû dixeyîdin. Gava ku dixeyîdin ji malê diçin. Dengbêj carinan nizanin ku jin çima belasebeb dixeyîdin.

“... Kawa mina kibar ji mi xeyîdiye ne li mal e...”(Kilama Emrê Min-III)

“... ezê dikim ramîsanekî li dev û lêvê şekirî lê kerem kim

gelî heval û hogirno ca ji min ra bibêjin xeyîdiye nizam çima...”

(Kilama Gidî Lo Yeman Tu Ya Min Î)

“... Kuro delalîko mi ji te ra nego ez ji te xeyîdîme ez ji te ra tu malê
nakim
ezê êla mala bavê xwe ji welatî tamam rakim
tu dêhna xwe bidê dost û dujmina tamamî li te şa kim...”
(Kilama Gula Şebo)

“... mi sond xwarî
send xençerê li min xin ezê ranabim ji kêlekê hû wî lo ji teniştê
bê xezal hayê hê hê hê hê yî ye bi,
gidîno xezala mi xeyîdiye hûy ax lo bi mi ra nayê...”
(Kilama Xezal Dînê)

Ew, hem bê qewl in, hem bê qirar in. Di kilaman de wek gaziyekê ev herdu peyv berî gotina daxwaziyê tên gotin. Şakiro ji bo kirina gazincekê ev form ava kiriye.

“...bê qewlê bê qirarê tu sêr bike ji gavê din da ew ji derba xirab bû
te li min xistî vê sibengê derba kêrê, tîra vê xençerê...”
(Kilama Zera Mele)

“... tu vê sibengê bêbavê gelo tu bê esl î bê qewl î bê qirar î
tirsim zemanekî xirab were di dan heval û hogirê me da
tu ji mi ra bêji qardaş, ez ji te ra bibêjim bacî lê lê...”
(Kilama Delal Gimgimê-Subha Hacî)

“... le Dîlber zozanî fêzî mala zozanî me ne
bêqewlê, bêqirarê
hêşîn nabe şûna kêf û henek û laqirdiyê min û te...”
(Kilama Dîlbera Mîrê Tatosê)

*“... mi şeva îşev kêfê ra xewnek dîtîbû ji bejna zirav ra di xewê da
wey la bê qewlê bê qîrarê
mi dî vê sibengê tu dabûne kotiyê mêra...”*

(Kilama Ax Dîlber Ji Bona Te Mirî Me)

*“... gidyo gilî û gazin û loma ji dilê minê rezîlê bê qewlê bê qîrar
meke...”*

(Kilama Dîlber Hela Rabe)

“... ez ji te ra sond bixwim tu bêbext î bext û qewl û qîrarê te tunîne...”

(Kilama Hay Lo Dilî)

ii. Jin-Li Gel Tevgera Xwe

Dema ku jinên di nav kilaman de dimeşin, hûrik hûrik dimilmilin. Bi ordama qazê, bi meşa qulingê dimilmilin. Milmilîn bi giştî waxê çûyîna avê an jî waxtê ji avê hatinê pêk tê. Ku jin ji malê derkeve jî dimilmile.

*“... Lê lê sebrê sibe ye gelo vê sibengê
bejna zirav ji mal derket dimilmilî
berxê sibe bû mi dî serê şuştî, porê şilî
ber bi kaniya biniya Mala Ereb Axa
berjêr meşmeş dikir dimilmilî...”* (Kilama Dewran E Gulê Dêran E)

*“... minê bala xwe berdayê kewa gozel a gogerçîn
ji malê derketî ji derdê dilê rezîl ra dixemilî
gelî gundî cînarno ber bi xanika jêrîn ji xwe ra dimeşiya dimilmilî...”*

(Kilama Dewran E)

*“... berxa dilê mi gelo vê sibengê
jêliv dihate dimeşyabû berxê li dimilmilî
mi go esmerê xwelî li te be, li min lo yoy lo berxê, lo li vî dilî...”*
(Kilama Hay Lo Dilo Xwelî Li Te Be)

*“... tu bala xwe bidê kubara şîrîn ji gavê din da ji Birca Belek deketiye
bi ordama qazê, bi meşya quling, ji xwe ra dimeşe wa dimilmile...”*
(Kilama Dîlberê Serê Mi Diêşe)

*“... tev zalimê kûzê desta ê hê hê hê... cêrî li mil î
ber bi kaniya binya Mala Ereb Axa berjêr dimeşiya gundo
ezê diçûm pêşiyê hê hê hê dimilmilî...”* (Kilama Esmera Şukrî)

*“... reben ez im gelo vê sibengê mi dî kewa gozel ji malê derket
bi ordama qazê meşa quling berjêr dimeşiya dimilmilî...”*
(Kilama Ro Kurtik Bû Mi Têr Nedî)

Jin xwe bi terzekê, bi xemlekê naxemilînin. Xemla wan an bi şêst û şeş xeml e, an bi bîst û çar xeml e, an bi heftê du terz e. Ew ji bo yarên xwe xwe reng bi reng dixemilînin. Cotê zermemika, tê xemilandin. Piştî xemilandinê jin dikevin nav komê xaniman, zeriyan û berivanan; berê xwe didin zozanan.

*“... malxirabo minê tasa xwe li avê bixista
çavê xwe kil kira, natika xwe têt kira, biskê xwe hil kira
bîst û çar terza xwe bixemilanda...”* (Kilama Delêl)

*“... mi dî kewa gozel e gogerçîn
ji xwe ra ji malê derketî xwe xemiland*

*ketiye nava komê xaniman û zeriyan û bêrîvana
berê xwe dabû zozan û yayla... ” (Kilama Yar Kubara Min Yar)*

*“... ezê vê sibengê mal xirabo bejna xwe bixemilînim
şam û qutniyê Helebê
tu sêr bike qolê zêran û zîvan bavêm gerdena zer
malxirabo kembera zêr û zîvîn bidim bejna zirav
gelo vê sibengê li nava xwe hermetê... ” (Kilama Dilo Ha Yar Yar)*

*“... ezê derketime gazan û bêlana
minê ji xwe ra dêhna xwe dabû heval û hogira
kewa gozel ji xwe ra sekiniye vê sibengê bi şêst û şeş awaza dixemilî
ji eşqa dilê rezîl ra gelo xwe dabû şitavan û dûzana... ”
(Kilama Dewrê Bedewê)*

*“... Lê gewrê bexê sibe ye mi bihîstiye
tê berê xwe bidî wan çiya û bêlanê bilind, van zozana
minê li gavê din da nizanibû te ji kîjan xortê xelkê ra xwe xemiland
bi şêst û şeş awaza çêkiriye
şirika bêxwediya xizêmê ketiye ser lêvan û dirana... ”
(Kilama Gewrê Zalimê)*

*“... ez ji te ra sond bixwim ezê şevan û roja
bona xatirê Şahê Dengbêja, Kewê Gozel xwe dixemilînim reng û bi
reng e
cotê zer guliya ser piştta xwe da berdidim, berxo lo peng bi peng e... ”
(Kilama Sosin Ê Şahê Dengbêja)*

Jin an ji avê tîn, an li ser kaniyê ne, an jî diçin avê. Waxtê ku dê biçin avê cote elbên toqatî di destê wan de ye. Ew, meşmeş dîkin diçin; carinan dengêj temaşaya wan dike, carinan derdikeve li pêşiya wan.

“... *Gelî heval û hogirno sibe ye
kanî dûr e bejna zirav bexê ax lo ji avê tê
bê bejna zirav gerdena êlî qolê zêra çuqa lê tê...*”

(Kilama Lo Yeman Ez Fîrar Im)

“... *Dîlberê sibe ye vê sibengê mi ji te ra nego
tu rabe cote elbê toqatî bavê zendê zerbadayî
ji jor da were ser kanîka biniya mala
ez ji te ra sond bixwim ezê li banê qesrê li ber pencerê bisekinim
ji kedera dilê rezîl ra qasekî dêhna xwe bidim girêdana xerîb bejn û
bala...*”

(Kilama Dîlber Hela Rabe)

“... *mi dî şîrîna mi ji xwe ra ji malê derket
berxê bejna zirav da şitavê, tûncika narîn ji xwe ra şe kir
qolê zêra ji kêfê ra gelo vê sibengê dabû ber kofiyê hey lûr
îro ji kêfê ra meşiya ser kaniyê
berxê gidî ji kedera dilê rezîl ra
mi dî kezabî bavê pîra dê disenîne li banê qesrê li me mêze kir
minê ji kedera dilê rezîl ra eyb û şermîn ji ortê hilanî
ez ji te ra sond bixwim meşiyame diçûm di pêşiyê...*” (Kilama Hey Lûr)

“... *ezê çûme pêşiyê mi go gelî xortno hûnê ku da biçin
digo xalo tu nizanî qîz û bûkê me meşyane ser kanîka
ax lo Kanokvanê...*” (Kilama Dêrika Ewranê)

*“... ezê bi te kim, tu Rebî dihebînî
bi awirê çava, bi qinyatê dila, îşaretê desta bang te bikim
tu meskin hetanî ser kanîka biniya mala ji xwe ra were...”*

(Kilama Dîlberê Ca Rabe)

*“... Êrê dewrê gelo sibe ye li me sura sibê bîna bê tê
gidîno kanî dûr e muhuba dilê mi ji avê tê...”*

(Kilama Dilê Min Hêlîna Teyrê Sîmir E)

c. Di Kilamên Şakiro De Jin Bi Nihêrînên Din Ve

i. Şibandina Ajalan

Jin bi kewan re hatine şibandin. Hunera teşbîhê di kilaman de bi van şeklan derdikeve pêş me. Kew; gozel e, gogerçîn e. Ew kubar e, nazik e, nazenîn e. Di hin kilaman de ew kew, kewa perbelek e. Kew dike qebeqeb. Awaza wê tê dengbêj, dengbêj dixwaze bi wê re bigere. Di nav ajalan de herî zêde kew ketiye nava kilaman. Car caran wek “kaw” jî derbas dibe.

“... gava derbas dibû heval û hogira gotiye kewa gozel ev e...”

(Kilama Kewa Gozel a Bilîcanê)

*“... mi dî kewa min a gozel a gogerçîn bi şêst û şeş awaza, bi heftê du
terza...” (Kilama Wer Tu Wer)*

*“... kî dîtiye kî bînaye yeke fenanî kewa gozel e gogerçîn dosta merû be
dêrisê gunda da merû bi destê kewa gozel bigre...”*

(Kilama Narîn Narîn)

*“... kî dîtî kî bînaye yeke fenanî kewa gozel e gogerçîn dosta merû be
dêrisê gunda da merû bi destê kewa gozel bigre
ji kedera dilê xwe yê rezîl ra vê sibengê di qar û bêgarê xirab da
gelo vê sibengê bê Rebî bibe ser hewiyê...” (Kilama Narîn Narîn)*

*“... de rabe vê sibengê kî dîtiye kî bînaye
kewa gozel heft sala rêka merû bekle ke*

...

gelî heval û hogirno vê sibengê hûn dêhna xwe bidinê

*kewa min e gozel e gogerçîn ji malê derket derê
Xwedê xira bike vê sibengê li sêrî şara zer e...*

(Kilama Esmer Wele Nabe)

*“... kawê kubarê tu bala xwe bide vê sibengê
mi dî reşêşekî baranê pê ra hûrik hûrik ji xwe ra wa dibarî
kewê gozelê te dilê mi kirî hêlînek ji hêlîna teyrê ji teyrê narîn*

...

*ezê li kêleka kewa gozel i gogerçîn i nazik û nazenîn rûnê
ji derd û kulê dilê xwe ra bibêjim
bira kawa min a kubar i nazdenîn ji derdê dilê rezîl ra
gelo vê sibengê biki fixan û zarîn...” (Kilama Esmerê)*

Jin bûne xezal, derbasî kilaman bûne. Di hin kilaman de xezal kûvî ye, di hinekan de ne wisa ye. Di kilamê de ku bi gotina jinê dengbêj kilamê bibêje forma “xezala kûvî bûm lo nebûm kedî” derdikeve pêş me. Çavê xezalê li revê ye, dilê xezalê li seknê ye; teswîreke wisa hatiye kirin. Ew hem diçêre, hem dikayê.

*“...ax eman eman wer gidî
lawko gidî xezala kûvî bûm lo nebûm kedî...” (Kilama Babikê)*

*“... bê xezal hayê hê hê hê hê yî ye bi,
gidîno xezala mi xeyîdiye hûy ax lo bi mi ra nayê
sebrê gilî gazin û loma ji mi nekin
çavê xezala mi li revê bû, dilê xezala mi li seknê bû
tu bala xwe bidê him diçêre Rebiyo lo him dikayê...”*

(Kilama Xezal Dînê)

*“... eman eman eman gidî
ro kurtik bû gelo mi têr nedî
te ez kiribûm xezala kuvî nebûm kedî
lawkê cindî şevê nîvê şevê li xewna xwe dî...”*

(Kilama Ro Kurtik Bû Mi Têr Nedî)

*“... Nêçîrvan digo de lê lê xezalê tu nizanî gelo ne ez Şemo me
ez Şemo me xwedanê hefsid miyê serê di çiyê
donzdeh kehêlê serê tewlê me...” (Kilama Nêçîrvano)*

“Le wey lê wey lê...

*kuro kulmalo ezê xezal im xezala çiyay mezin çiyay mezin
êtîmo tu sêr bike nêçîrvana xezala mi rakirin
tajî û tûlê xwe berdanê
li dû xezala mi direvin wa dibezin...”*

(Kilama Ez Xezal Im Xezala Çiyayê Vê Yemenê)

“Eman hey lê were hey lê hey lê hey lê...

*wî de lê lê delaliyê minê xezalekê rakirî ji sazê Mêrdînê ji bêderê
tu sêr bike vê sibengê pişta xezala mi ketî gaz û bêlanê bilind
berê xezala mi ketî zozanek ji zozanê Elenderê
gidiyê bira tu bûka mala bavê mi bûya
destê mi bi destê te biketa
minê ramîsanekî li dêmê gulî kerem bikira...”*

(Kilama Hey Lê Ku Hey Lê-Sazê Mêrdînê)

Jin bi qazan re hatine şibandin. Waxtê ku ew bi rê de çûne, dema ku wan milmilandiye wek çûyîna bedew a qazan, bi ordama qazan meşiyane. Gerdena yarê wek gerdena qazan bedew e.

*“... hela bala xwe bidê vê sibengê mi dî kewa gozel ji xwe ra sêl hilanî
ji mal derket bi ordama qazê vê sibengê meşa quling
nav koçerê jêrîn da dimeşiya lo dimilmilî eman...”*

(Kilama Bermaliya Mêrê Kotî)

*“... gundo tu xirav bî gelo vê sibengê bi hewar û gazî
minê bala xwe berdayê kawa min a kubar i nazik i nazenîn
gelo vê sibengê tu kew î, tu gozel î, gelo tu qaz î...”*

(Kilama Emrê Min-I)

*“... gerdena êlî fenanî gerdena qazayê
pozê piçûkî fenanî nikulê di kewayê...”* (Kilama Têlî)

*“mi dî tu bi ordama qazê bi meşa quling
te meşmeş kiriye di jor da tu dihatî...”*

(Kilama Delala Gimgimê-Subha Hacı)

*“Lê lê qazê lê lê zalimê
Buhar e serê min dêşe
dilê min ji bona te yane yane*

...

*Qaza min qazîn e
yeke bejnzirav e,
çepildirêj e, porkej e, navqendîl e...”* (Kilama Lê Lê Qazê)

Ji bo wan nîdaya “berxê” hatiye kirin. Piştî nîdaya kewê, herî zehf gaziya berxê hatiye kirin. Îfadeya “berxa dilê min” zêdetir derbasî nav kilaman bûye. Mebest ji gotina vê peyvê biçûkî, delaliya keçikê ye.

*“... berxê tu rabe bala xwe bidê ez ê derketim banê qesrê
gundo tu xirav bî gelo vê sibengê bi hewar û gazî
minê bala xwe berdayê kawa min a kubar i nazik i nazenîn
gelo vê sibengê tu kew î, tu gozel î, gelo tu qaz î*

...

*berxê ez ê vê sibengê hetanî bejna zirav nebînim
nayê sebra mi sebrê, sebra mi sebrê.”* (Kilama Emrê Min-I)

*“... berxê gidî ji kedera dilê rezîl ra
mi dî kezabî bavê pîra dê disenîne li banê qesrê li me mêze kir...”*

(Kilama Hey Lûr)

*“... berxa dilê mi tu nizanî çend salê mi tamam bû
ez evdalê Xwedê dêrisê gunda da
bûm aşiqê te şêrînê xeberxweşê yar yar lo çavbelekê...”*

(Kilama Ez Ê Kewa Gozel)

*“... berxa dilê mi temî weyseta mi li te be
kêleka xwe mede kêleka kotiyê mêra
pê re mijûl nebe, xeber nede...”* (Kilama Berxa Dilê Min)

*“... berxê gidî gelo te konê mi ji erdê rakir
konî heramî mêrê xirab li dewşê danî...”*

(Kilama Çiyayê Mûşa Şewitî Bê Dar Nabe-II)

*“...berxa dilê mi dema tu ji gotinê û sozê xwe pîşman î
sed wehde li bedena mi ketibe fenanî qanûna dewletê
di para dilê mi da tu berat î lê lê, lê lê ax de lê lê...”*

(Kilama Delal Gimgimê-Subha Hacî)

Ji bo wan Şakiro gotiye kehêl. Di kilaman de waxtê ku şibandina kihêlan tê kirin bi giştî qala kihêlên Ubeydayê tê kirin. Kihêl hespekî bi qîmet e, ne ji rêzê ye.

*“... gula mi fenanî kehêl e ji kehêla di Ubeyda
pêşîrê bi rixm e, serê wan bi rişm e
merû gemek ji gemê Diyarbekirî li dêv bixîne
zînek ji zîne Şamê navmil lê bîne
rimek şitavê destê xwe bixîne
lingê xwe bike rikêfê, destê xwe bavê dizgîne
ji kederê dilê rezîl rabe orta zîn
lê lê sebrê terş û talan rake
îro ji êvar da bîne ji Erebaştanê dilo yar yar yar...”*

(Kilama Gula Mi Fenanî Kehêla)

“... kawa min a kubar û nazike nazenîn fenanî kehêlek ji kehêlê di

Ubeyda

*pêşîrî bi rext e, serî wan bi rişm e
merû gemekî ji gemê Diyarbekirî dêv bixîni
zînekî ji zîne Şamê nav milê wê bîne
rimekî şitavê destê xwe bixîne
lingê xwe bike rikêfê destê xwe bavê dizgîne
rabe orta zîn e terş û talan rake...”* (Kilama Herê Lê Delaliyê)

*“... Gidî bes e lo lawiko gidî lo lawa te ez helandim
di dêrisê gunda da te ne ez xwestim lo ne revandim
fenanî kehêlek ji kehêlê Ubeyda
li derê konê mala bavê xwe ra tim û tim cara ez bezandim...”*

(Kilama Lawikê Deşta Siwêrekê)

*“... sebra dilê mi fenanî kehêlek ji kehêlê Ubeyda
avêtiye zendê zerbadayî cotê elbê jê toqatî...”*

(Kilama Delala Gimgimê-Suhba Hacî)

“De lê lê lê ax lê lê Gulê

Gula welatê me Serhedê

bi ordama xerîbê

kehêla derê Mala Derîhê...” (Kilama Gula Serhedê-Gula Mala Emer)

“... her sê kehêlê Mala Osman Nûrî ne

Eyşo Xanim di nav da ne

kehêleke menşûr e bi kêl û bi kember e

bi rext û bi ruşme bi gem û jê bi zîn e...” (Kilama Osman Nûrî Paşa)

ii. Unsurên Din

Di kilamên Şakiro yên evîniyê de gelek caran destpêk bi gazîkirinê ve, bi feryadekê ve destpê dikin. Dengbêj dixwaze ku eşqa dilê xwe bi peyva pêşîn ve îfade bike. Gotina ewilîn an navê jinekê ye, an nîdayek e, an emanek e, an jî dengê nenas (wek: hahîîî wax ay...) e. Jina ku tê îdealîzekirin berî teswîrê gazî lê tê kirin. Kilamên ji bo piştgiriya vê îfadeyê gelek in.

“Delal lê hayê hayê wayê ax hayê

...

Eman hayê hayê hayê wayê

...

*Lê bi rojê ez ê bêjim delal
bi saetê li deqîqê delal, li çarîkê delal
li gavê delal, li lahzê delal... ” (Kilama Delêl)*

*“Lê lê muhubê hela tu rabe gelo
vê sibengê welatê me Serhed e*

...

*berxê lê ax lo li minê
ez ê bêjim kubarê li minê... ” (Kilama Berxa Dilê Min)*

“Hewar hewar hewar

hewara me Xwedê... ” (Kilama Heqî)

“Têlî Serayê wî lê lê ca rabe

bira li me nehata sura sibê... ” (Kilama Seraya Mamed Axa)

“Gulê dêranê ava zemzemê

Kevirê Heci-l Eswedê Beyta Şerîf

lo hoy lo ho lo ho lo hoy... tamam yek e... ” (Kilama Gulê Dêranê)

“Bê hay lo dilî hay lo dilî hay lo dilî

xwelî li te be, li mi, li vî dilî... ” (Kilama Hay Lo Dilî)

Dengbêj Şakiro gelek caran di nav kilamê de êşa xwe, derdê xwe eşkere dike. Ev êşeke nedîtî ye, derd sertacê hemû derdan e; di kilaman de dilê dengbêj ji bo kesa ku tê îdealîzekirin, ji bo eşqê dişewite. Gelek caran gava ku ew wê evîndariya xwe tîne ziman pê re tembîh û

wesiyeta xwe jî dibêje. Wek gotinên axirîn vê daxwazê bilêv dike. Carinan ji yara xwe re jî tembîh û wesiyeta xwe, daxwaziya dilê xwe tîne ziman.

“... *gelî gundî cînarno temî û weyseta mi li we be ez nexweş im ez
dimirim
hûn ê kefenê mi bibirin çîtê dêrê qîza ax lo filankesê hewara Xwedê...*”
(Kilama Xezal Dînê)

“..*êtîmo temiya mi li te be vê sibengê gilî û gazin û loma ji mi nekin
derdê mi sertacê hemû derda ye...*” (Kilama Derdgirano)

“..*felek xayîn e qûça me hildiweşîne, lema alîkî dilê min bi xem e
ax gidîno tu sêr bike serê dilê mi alîkî bi kul e
yekî bi derd e yek keder e yek birîn e...*”
(Kilama Gula Mi Fenanî Kehêla)

“... *berxa dilê min temî weyseta mi li te be
kêleka xwe mede kêleka kotiyê mêra
pê ra mijûl nebe, xeber nede
ez ê di bextê te û Xwedê ketime
kofîka şeng nede, dûzanê girê mede...*” (Kilama Berxa Dilê Min)

“... *bê dilber hayê wayê hayê wayê... bê gidî were
tu nizanî mereqa gi li dilê mi pir e
dilê mi ji xwe ra tamamî bi kul û derd û bi keser e...*”
(Kilama Dilberê Mi Ji Te Ra Nego Bi Çiyê Da Mere)

“... *berxê gidî temiya mi li te be ezê bi te kim tu Xwedê dihebînî
yek siwalek ji te ra dibêm yanî bêje na
hewar gidî yanî ji xwe ra bêje belê...*” (Kilama Sosin Ê Ferzê-I)

Dengbêj gava ku bersivê ji keçikê hîlnade an jî gava ku berteka keçikê ne bi dilê dengbêj dibe, ew nifirên, îfadeyên wek “malxirabê, bêbextê, zalimê...” bikar tîne. Jin car caran bêbext e, malmîrat e. Dengbêj ji bo gazîkirinê bi van peyvan dest bi ferdayê dike. Carinan ev peyv tên gotin, bi dû re gazinc tên kirin. Carinan hin nifir jî tên kirin. Jina îdealîzekirî malxirab e, bêbext e, zalim e.

*“... lê lê sebrê gelo malxirabê kesek tune ji kotiyê mêra ra bibêje
orta Xaç û Xidir Nebî nav taxima sing û berê Dîlbera mi da
bê gidiyê lê gul dibarî...” (Kilama Dîlbilmezê Mi Çi Go)*

*“... ez ê tu nifirê li te nakim
belkî konê mala bavê te agir bikevê ji sêrî were bine...”*

(Kilama Gorî Gorî Sebrê)

*“... hey malmîrat hela were di derdê dilê rezîl ra îro çendê mi tamam
bû
çima ezê bûme qaçax lo bi fîrar e wax li min...” (Kilama Baxê Fexo)*

*“...malxirabê te êmîşê nav dikanê
qewala ser zar û zimanê di xortanê
wey meraqa dilê kalan û pîranê...” (Kilama Bêrîvana Mala Mezin)*

*“Emerkê digo
qîza Tucar Axa sibe ye ez Emo me Emongê delodîn im
ezê vê sibengê malxirabê bi quweta mi nîne bi quweta Rebê di Jorîne
ez ê çek û sileha xwe li xwe kim qema qabirme zîvîn li bejna xwe
bişidînim...”*

(Kilama Emerkê Ê Qîza Tucar Axa)

“... Zalimê ezê ji te ra bibêjim hey wayê...” (Kilama Kubara Şîşman)

Dengbêj di kilaman de nexweş e, cigera wî bi kul e. Eman dike. Ji bo birîna xwe derman digere. Dilê wî ji bo yara wî bi kul e, bi derd û bi keder e, bi meraq û bi xem e. Nexweş e, nexweşê bêhal e, nexweşê nava ciyan e. Bêfeyde û birîndar e, birînkûr e. Kew li birîna wî nayê. Derdlî, meramlî, meraqlî ye, halê wî tune ye. Evîna dilê wî ewqas birîneke kûr di bedena wî de vekiriye ku jê re derman nayên dîtin. Hekîm, sertabîp, doxtor... bi dehan kes digerin lê jê re çareyê nabînin, car caran heta birînê jî nabînin. Her çi kesê ku tîra eşqê li dilê wî bikeve, derman li ba kesî nabîne. Dermanê ku tê çêkirin jî gelek caran ji tiştên cûrbicûr çêdibe; ji şîr û şekir, ji kilsê... Me di qeydan de nedît ku Şakiro kilama Evdalê Zeynê ya bi navê Hekîmo gotiyê lê di vê kilamê de li gorî gotina Şeroyê Biro merhem *ji tûvê henikan, ji donê zeytê, ji koka darê, ji şîrê teyrê bazî jî çêdibe* (Yerêvanê, 2014). Di hinek kilaman de derman di destmala destê jinê de ye. Ji bo derdê dil jin hem melhem e, hem şekir e, hem nebat e.

“...ez ê li bajara geriyam li bajara Diyarbekir
li ser doxtor û hekîm û sertebîpê di dewletê
mi go doxtoro bi te kim, tu yê bi Xwedê kî
tu yê dermanekî li mi, li vê birînê kî
go mala te xirav be herçî kesê ku tîra eşqê li serê dilê wî bixîne
dermanê birîna wî li ba mi nîne...” (Kilama Esmera Şukrî)

“...Xezal dînê dibe bû ez ê bê nexweş im ax rebeno li minê lo birîn neksê
kesekê xwedanê xêra tunîni cewabekî bide xezala mi bi tenê
melhemekî çêbike ji şîr û şekir lo ji arê kilsê hewû rebeno gidî...”

(Kilama Xezal Dînê)

“...Hekîmê Loqman serê xwe rake ji axa û berayê
geriya negeriya devê birîna li canê mi gulibira Xwedê li nexûyaye...”

(Kilama Wer Tu Wer)

*“... delîl ez bi qurban ji êvara Xwedê da
derbekî xençerê li serê dilê mi xistiye
hekîm û doxtor û sertebîbê dewletê tev rabûne
ez ê vê sibengê dikim nakim îro ji êvar da kew lê nayê...”*

(Kilama Têlî Delal)

*“... teyê derbeke xençerê li serê dilê mi daye
êtîmo gelo vê sibengê cewabek nebxêrê hatî
Hekîmê Loqman serê xwe rake ji axa û ji beraye
geriya negeriya devê birîna li canê mi gulîbira Xwedê lo nexûyaye...”*

(Kilama Wer Tu Wer)

*“.. te derbekî xençerê li serê dilê mi daye
tu Hekîmê Loqman ji ax û berê sar tu rakî
ez ji te ra sond bixwim tu cara nabîne kew û melhema hê vê birînê
gidiyê gelo tu rabi cîkê mi dayni li banê qesrê li bircê kelê
hewû rebenê gelo li ber pencerê hê li şaneşînê
berxê bi desmala ser destê xwe li ser çavê mi bike bangê hê baweşîne
sebrê hînga ez dizanim dêrisê gunda da mi ji xwe ra vê sibengê dîtîbû
gidiyê gelo kew û melhema hehû rebenê hê vê birînê...”*

(Kilama Bi Hesabê Hesabdara)

Xelk tim dibe aşîqê/harisê mal û hal û temelê dunyalikê, lê dengbêj jina ku jê hez dike nade tiştên mîna van; ew li ser her tiştê madî ye. Şakiro piştî îfadeya “xelk bû aşîqê mal û hal û temelê dunyalikê” forma “ez jî bûm aşîqê vê, vê, vê” bikar tîne. Ev tişt bejn û bal e, por e, timtêl e, çepil e, nav e, dêm e û hemû tiştên din ên îdealîzekirî ne.

*“...vê sibengê xelk bû aşîqê mal û hal û temelê dunyalikê
ez bûm aşîqê bejn û bala Gewrê dev û lêvê şekirî...”*

(Kilama Lo Yeman Ez Fîrar Im)

*“... dibê gelo xelk bû harisê mal û milkê temelê dunyalikê
malxirabê ez ê bûm harisê bejna zirav
porê serê Sosin fenanî pûrta teyrê tawis
gelo dîsa bi aşiqê bejn û bala Sosina xwe me
bê Rebiyo lo çiqazulm e*

...

*malxirabê gelo xelk bû aşiqê mal û hal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqaz te narîne bejna zirav gelo timtêla kelê
bê Rebî çiqazulm e...” (Kilama Sosin Ê Ferzê-I)*

*“... esmerê xelk bû aşiqê hal û mal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqaz te bejnziravê, çepildirêjê,
porkêjê, navqendîlê, sebrê lo kofixwarê...”*

(Kilama Ez Xezal Im Xirabmal Im)

*“... felek were xelk bû aşiqê mal û hal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê di kaviliyê gunda da
bi hêsîr û dîla timtêla xerîb, çav û buryê reş û belek
dêmê gulî, yanaxî ehmedî, terzê di hakimî, şemlê di Erebi
wey Xwedêyo gerdana di zer, çepilê dirêj, bejna top e gilover
wey gidîno ax lo kina xwemo...” (Kilama Çemo)*

*“... hehû zalimê tu nizanî xelk bû harisê mal û hal û temelê dunyalikê
sebrê gelo ez aşiqê bejn û bal û girêdan û timtêla te me...”*

(Kilama Dîlberê Mi Ji Te Ra Nego Bi Çiyê Da Mere)

*“... xelk bû aşiqê mal û hal û temelê dunyalikê
ez evdalê Xwedê bûm aşiqê bejna zirav,
dê mê gulî, yanaxî ehmedî, terzê di hakimî
girêdana kofiya te ta jê di şenge...” (Kilama Xemê)*

“Min sond xwarî...” Ev zêdetir îfade ye ku bi awaza Şakiro di kilaman de cihê xwe digire. Şakiro ji bo jinikê sond û qeseman dixwe, bi dû re tiştê ku dê bike rêz dike an jî bûyerê vedibêje. Dengbêj dixwaze guhdarvan û kesa ku jê hez dike bi wî bawer bike. Ji ber vê daxwazê sondên cûrbicûr derdikevin li pêş me. Sond zêdetir li ser Quranê, Yasînê, dîn û îmanê, jin berdanê hatine kirin.

*“... ji bo kawê kubarê ez ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê,
bi navê Quranê, bi dîn û îmanê, bi telaqa jinberdanê
kotiye miskîne heramî mêra bimire ez tu cara narim serxweşiyê...”
(Kilama Yar Gidî Yar)*

*“... ez ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê,
bi navê Quranê bi dîn û îmanê, bi telaqê jinberdanê
ez tu cara gelo vê sibengê bûme bekçiyê ber derê mala bavê te kubarê
ez ê ji xwe ra bekle bikim ji sibê heyani êvarê...”
(Kilama Yar Yar Kewê Kubarê)*

*“... esmera mi ji xwe ra bi dewrana dunyalikê guven mebe
ez ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê, bi navê Quranê
ew çav û buryê reş û belek çêbûne
ji bona axa sar, herçar rojê qebrê ne
kubara mi yar yar...” (Kilama Yar Kubara Min Yar)*

*“... ez ji te ra sond bixwim ezê destê xwe bavê nava xal û xetê di
gerdenê*

*gelî gundî cînarno nava helî morî mircan û moriya
ezê biqetînim bikim ser orxan û doşegê qûştûgî... ” (Kilama Nazê)*

*“... ez ji te ra sond bixwim Esmer gul e fenanî guleke nav rihana jê bi
bîn e
herçî xortê bendê welatê me bira tamam berhev bibin
herkesî pelekî ji xwe ra jê biqetîne... ” (Kilama Esmera’ m Were)*

*“ez ji te ra sond bixwim heft car ewqas bîrya te kir
mi sond xwarî dêrisê gunda da vê sibengê gelo
ezê tu cara terka bejna zirav nadim
heta fermana mi ranebe ji Şam û Heleb ji Diyarbekir
berxo vê sibengê herçî kesê fesadiya xwe kir
ezê ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê
di dêrisê gunda da mi tu car qebûl nekir... ” (Kilama Gorî Gorî Sebrê)*

Di kilaman de kes ku keç be wê didine mêrekî kotî, ku jin be mêrê jinê tim kotî ye. Ev peyv ji peyva Tirkî ya kötû tê, li Serhedê tê wateya kesê xirab, yê nebiqîmet, yê bêxêr. Bi vê wateyê ve ev peyv dikeve nav kilaman. Dengbêj/evîndar çê ye lê yê ku jin digihîje wî, kesekî, mêrekî ji rêzê ye. Carinan bavê jinê wê dide mêrê kotî, jin li ser vê nifiran dîkin. Ji ber ku ew mêr ne tenê kotî ne jî; miskîn in, heram in, xirab in, şeytan in, şindokî ne, çepal in, mirdal in, marus in. Li van îfadeyan herwiha mêr li jinê nayên layiqdîtin. Jin ewçend bedew in ku belkî tu mêr lê neyên. Dîsa îfadeyeke din a qalibgirtî derdikeve pêş me: jinên çê her tim dibin para mêrên kotî. Di kilaman de bi giştî gava ku dengbêj û jin hevdu dibînin mêrê kotî ne li ba wan e lê hîsa tirs û endîşeyê carinan tevî kilaman dibe, carinan jî dengbêj an jî jin dîkin ku wêrekiyan nîşan bidin û bigihîjin hevdu.

*“...Xwedê bi dê û bavê min ra qebûl neke, qe hilmede
dame kotî miskînê namerdî heramî mêrê xirab... ” (Kilama Sebra Dila)*

*“... Xwedê bi dê û bavê mi ra qebûl meke qe hilmede
lawikê cindî mal di gund da
mine tê dixwestin mi nedayê
girtim dame kotî mîskînî namerdî heramî mêra...”*

(Kilama Ez Gul Im Gula Di Zinêr Da)

*“... mi digo kotiyê mêra ne li mal i
tuyê şeva îşev bişkînî
cam û camekana şûşe û pencera zirza dêrî
şeva xwe li nav taxîma sing û berê min esmerê da bibihêrî
mi nizanibû tu ne mêr î ne camêr î
tu ji miskînê heremê mêrê min newêrî*

...

*gelo vê sibengê malxirabo ji tirsî heramê miskînê mêrê xwe newêrim
ezê vê sibengê berdilka Erebi reşî lêvdeqandî
xîmê binê berya tewra jêr im...”* (Kilama Wey Dil)

*“... tu dêhna xwe bidê gelo ezê bejna xwe ji te ra çêbikim
gelo simbêla mi xweş simbêl e
kotiyê mêrê te zengîn e
tirsim di dêrisê gunda da mi bikuje li dunyayê lo mi nehêle*

...

*ez ji te ra sond bixwim kotiyê mêrê te
bira vê sibengê ji kerba bibebece
li ser bixwîne Quranê vê Yasîne...”* (Kilama Min Birevîne)

*“... xwezil ji xêrê xwediyê di Xwedê ra
xwedanxêr ku mizgîniyekî xêrê baniya
bigota kotî miskînê heramê mêrê muhuba dilê te ne li mal e
minê qaskî kolosê spî xwar bikira*

*ezê bihatama ji qarê dilê rezil ra ji kêfê ra rûniştama ê hê hê ca li ba
te...”*

(Kilama Derê Xaniyê Mala Bavê Dîlbera Mi Du Qanat E)

*“... Xwedê bi dê û bavê mi ra qebûl meke qe hilmede
lawikê cindî mi dil têda mal di gund da
dixwestin min nedanê
girtim dame kotî miskînê namerdî haramê mêrê xirab
tu sêr bikî dewlekî heramî pîsê vî namerdê peyda biye
ji êvarê heyanî mîla ber şeveqê
eman jê ra lûrî ax lo berxê dikim dibêm heylûr lûrî nabe...”*

(Kilama Êmê)

Dengêj jinê dike “bermalî”, “xanima nava êlê”; xwe jî dike “malxwê”, “axa”. Dike ku jin jê re bibe bûka mala bavê wî, bibe kesa li ber mala wî; ew jî li mala xwe bibe xwedî. Şakiro dixwaze bila ew tenê nebe bermalî, bila bibe bermaliya teze jî, bila bibe bermaliya mala wî ya giran.

*“... xwezil ji xêrê xweziyê di Xwedê ra
tu bûka mala bavê mi ba, ji mi ra bibiya bermaliya teze
...
keçê kulmalê xwezil ji xêrê xweziyê di Xwedê ra tu bûka mala bavê mi
ba
ji mi ra bibiya bermaliya teze ez ê ji te ra bibûma malxwê...”*

(Kilama Navê Te Xatûn E)

*“... eman Esmer hê hê Esmer horî
yeman gidî gelo keçka taxa jorîn
xweziya tu ji mi ra bibiya bermaliya teze
ezê bibûma malxoy minê bigota*

bermaliya teze ez bi qurban hê hê ez bi gorî...

(Kilama Esmer Wele Nabe)

*“... xwezil ji xêrê xweziyê di Xwedê ra
tu ji min ra bibûyayê bermaliya mala giran
ezê ji te ra bibûma malxoyê li ber mala teze ye...”*

(Kilama Dêrika Ewranê)

*“... heft xwezila bi wê çaxê Gula Şebo bibiya qîza malê
bûka malxirabo ber destê xasî û xezûra
ezê bibûma zavê malxoy li ber malê*

...

*berxa dilê mi gelo tuyê vê sibengê
ezê bibûma axa tu bibûya xanima nava êlê...”* (Kilama Gula Şebo)

*“... go delaliyê heft xwezila bi xêrê xweziyê di Xwedê ra
tu ji mala me ra bûk bûyayî ez xwe te ra malxwêy bûma...”*

(Kilama Bermaliya Mêrê Kotî)

*“... xwezila tu bûka mala mi bûya
çend saleka ji min ra bibiya bermaliya teze
minê ji te ra dêrisê gunda da bigota keçê kulmalê
te ji min ra bigota evdalo gidîyê hê dîsa kuro...”*

(Kilama Bi Hesabê Hesabdara)

Kilamên ku rasterast li ser kesekê hatine nivîsîn jixwe nav tê de derbas bûne. Lê yê ku nav tê de tune ne bi îfadeyên wek “navê te te nizanîm”, “... navê te nizanîm”, “navê te nizanîm ezê ji te ra dibêjim ...” hatine gotin. Ango navên jinên ku jê hatine hezkirin nehatine

gotin. Dengbêj dema ku navê keçike nizanibûye wek “dînê, keçka taxa jêrê, berxê, pêşmalzerê...” bi gaziyên cûr bi cûr gazî lê kiriye.

*“... Delîl digo qîzê kulmalê navê te nizanîm
ez ê bi sê denga bang bikim bêjim keçka taxa jêrîn...”*

(Kilama Delîlo Dilo)

*“... Lê lê bejna zirav sibe ye gelo mi ji te ra nego
ez navê te nizanîm bi navê şêrîn dibêim berxê Gewrê dînê...”*

(Kilama Lo Yeman Ez Fîrar Im)

*“... ezê navê te nizanîm dibêjim dînê
tu rabe bejna xwe girê bide
kofîka serê xwe çêbike
ezê herim pêşiya eniya kever lo tu bişidînî...”* (Kilama Min Birevîne)

*“...Keçkê dînê gelo îro çendê mi temam e
ezê digirim nagerim keskî dostê mi tunîne navê te ji mi ra bêje
ez ji te ra sond bixwim bejna mi zirav e
ji tayê rihana hoy oy hoy oy ber bi ro ye
li serê avê diçêrim berxê hoy oy hoy oy zo bi zo ye
...
berxo eger tu navê mi nizanî
bi navê şêrîn ezê aşiqê te me
gelo vê sibengê navê mi Sebîhe
bi xezalî ji mi ra dibêjin nav Sebo ye dîno...”*

(Kilama Lawikê Mi Şairê Rûdunyayê)

*“... De lê lê bedewê navê te nizanîm ezê bi navê şîrîn bang bikim
bibêjim palê lê pûlê lê lê çîlê
sêr bike ji gavê din da serê fidolyê daketiye ser nalça qonderê
ber cênîkê zîvîn ji jor da daketiye ser xizêmê qerenfilê...”*

(Kilama Hey Lê Ku Hey Lê-Sazê Mêrdînê)

*“... lê lê domamê navê te nizanîm
bi navê şîrîn bang te dikim gelo navê te Xatûn e...”* (Navê Te Xatûn E)

Gundî ji ber bedewiya keçîkê dexesiyan dikin û dixwazin ku navê keçîkê derkeve, ew rezîl bibe. Rasterast ew şeytaniyê dikin. Hemû çavên fesad û şeytanên gundan li dengbêj û yara wî ye. Ew, li gera biniya malan disekin, rûdinin, ji hev re qal û miqareta hezkiriyan dikin. Dengbêj ji ber fesadî û şeytaniya gundiyan xwe gazincan dike. Li gorî dengbêj, jin jî ji vê tiştê bêzar in û wekî dengbêj vê yekê tînin ziman. Car caran jî fesadî û şeytaniya gundiyan nabe mihmeta wan. Kê fesadiyê bike di kilaman de rasterast tê gotin, ew kes dê û bav bin jî.

*“... lawiko dîno go min sond xwarî bi sonda qesemê
sed wehde li bedena mi ketibe terka delaliyê dilê xwe jî nadim
heya fesad şeytanê gundê me têr fesadî nekin
navê min û delaliyê dilê mi bi hev ra dernekeve
li bajara xerîb lawko dîno lo li Stenbolê...”* (Kilama Eman Sebrê)

*“... tu dêhna xwe bidê lawikê mi ji welatê qurbetê hatiye
xizêmek ji dev û lêvê şekirî ra aniye
şirik daketin berxo li ser dirana
agirê kulê bikeve mala der û cînar û gundî û malî
fesada tevî van şeytana
sebra dilê mi bi tenê
hela rabe çawa nehîştine ez û delaliyê dilê xwe
qasekî li kêleka hevdu rûnên bi hev ra mijûl bibin
bikevin gilî gotin û ax lo qisedana...”* (Kilama Gundo)

*“... minê bala xwe berdayê fesad û şeytanê gundê me
li gera biniya mala sekinîn îro ji êvara Xwedê da li hevdu diciviyane
dikirin gilî û gotin û mijûlî û qisedan e
erê bawer dikirin gilî û gotin û mijûlî û qisedan e
tu dêhna xwe bidê minê gohê xwe dabû wan e
minê bala xwe berdayê miqareta me herduyan e...”*

(Kilama Keçê Kulmal)

*“... ca tu dêhna xwe bidê vê sibengê
der û cînar û gundî, malî, fesad û şeytanê me fesadiya xwe kirine
ji miskînî heramî mêrê te ra digotine...”*

(Kilama Dîlberê Mi Ji Te Ra Nego Bi Çîyê Da Mere)

*“... ez bi bextê te û Xwedê ketime
bira der û cînar û gundî malî bikin fesadiya xwe ye
tu nizanî va taxima sing û bera heft salî da mi xwedî kiriye
bêbexto yoy yoy yoy ew zozanê te ye.”*

(Kilama Ez Ê Delalîka Xwe Ji Malê Derketin)

*“... hela bala xwe bidê vê sibengê kopeka dê, kezabê bavê
rabûne ranebûne bûne vê sibengê mekruh bi fesadê li dû min û te ye...”*

(Kilama Keçê Dînê Dewranê)

Ew kesa ku jê tê hezkirin, bînbaşıya qîzan û bûkan e. Bînbaşı, peyveke Tirkî ye ku eslê wê ji “binbaşı”yê tê û wateya wê serdar e. Bi vê gotinê Şakiro jin berz kiriye, nekiriye kesa ji kesên ji rêzê. Qedemên biçûktirîn li jinê neaniye, xwastiye ku jin bi qedemên berztirîn werin bibîranîn.

“... gidîno bejna Esmera Şukrî bînbaşıya qîzan û bûka fenanî tayê
rihanê
malxirabo di mêrg û çîmenê mala bavê mi da vê sibengê...”
(Kilama Esmera Şukrî)

“... go Eyšê lê Eşya Îbê, bînbaşıya qîzan û bûkan...” (Kilama Eyşa Îbê)

“Sibe ye dilê mi li halê dilê mi kînekîn e
sibe ye Salihê lawê Mîrê Berêz serê xwe davêje ji xewa şîrîn e
Keja Mîrê Palo bînbaşıya qîzan û bûka le xewna xwe da dibîne...”
(Kilama Keja Mîrê Palo Û Salihê Kurê Mîrê Berêz)

Çîroka Ûsiv û Zulêxa ew çîroka efsaneyî ye ku wek “ahsenu’l-kasas” derbas dibe û wateya ahsenu’l-kasasê “ji çîrokan ya herî xweş” e (queenelifabeth, 2004). Çîroka Mem û Zîn bi navê “Memê Alan” di nav gelê kurd de gelek kevn û navdar e (Bozarslan, 1968). Şakiro van kesayetên navdar kiriye nav kilaman û herwiha hunera telmîhê derketiye pêş me. Li gorî Şakiro ew jin jineke ewqas bedew e ku weke Zînê ye, weke Zulêxayê ye, weke Belqîsayê ye, weke Leylayê ye. Herwiha evîna dengbêj û jinê jî mîna evîna Mem û Zîn e, mîna evîna Ûsiv û Zulêxa ye. Aqûbeta wan jî li gorî van çîrokan e.

“... malxirabê aqûbeta min û te
va bû aqûbeta Mem û Zînê, Hesen û Belqîsayê
ez bi qurban dîsa Ûsiv û Zelîxayê
de wayê de wayê de wayê de wayê...”
(Kilama De Wayê Kubarê Emrê Çû Êdî Nayê)

“... vê sibengê ez ê bala xwe didimê
aqûbeta min û te va bû aqûbeta Hesen û Belqîzayê

*sebra dilê min gelo aqûbeta Ûsiv û Zuleyxayê
lê lê lê wayê lê lê lê wayê... ” (Kilama Keçê Kulmal)*

*“... ez û gede lawikê xwe bi hev ra rast bûn
li gaza biniya kona rastê hevdu dihatin
fenanî Ley û Mecnûn tu sêr bike
li asîmanê hefta ketine gilî gotin û mijûlê qisedanê
...
li gaza binya kona rastê hevdu dihatin
fenanê Leyl û Mecnûn li asîmanê hefta
tu sêr bike ji kêfê ra bi hevdu şabûn yeman...”*

(Kilama De Lo Yeman)

*“... Lê hê muhubê mi kes nedî ji te rindtir li dunyayê
berxê sibe bû gerdena te zer e fenanî gerdena di Zînê
çav û buriyê te fenanî çav û buriyê Belqîzayê
tumtêl û girêdan û rêvaçûyîna te fenanê Zulêxayê...”*

(Kilama Tobedar Im Gewrê)

*“... aqûbeta min û Gewrê bû aqûbeta Hesên û Belqîsayê
Ûsiv û Zelêxayê sebro lo Mem û Zînê
axo li min axo li min lo ez fîrar im...” (Kilama Lo Yeman Ez Fîrar Im)*

*“... Haylo hay lo haylo Silo Begê minê qişle çêkir li yalê vê Mêrdînê
ezê ji xwe ra derî pê da bikim lo ji birrînê
vê sibengê aqûbeta min û te va bû aqûbeta Mem û Zînê...”*

(Kilama Silo Begê)

Îfadeyek din a di nav kilamên dengbêjiyê de ev e : “Ez ê te birevînim bavêm mala ...” Dengbêj piştî ku pesna jina îdealîzekirî dide vê formê bikar tîne. Dengbêj ji ber “mêrê kotî” nikare bi tena serê xwe birevîne, an jî ji ber “kezab dê û kopek bav” nikari bigihîje jinê; ev jî dibe sedema lêgerînekê. Ji ber vê, ew dike ku xwe biavêje li ber bextê maleke giran. Çareya dengbêj ew e ku berê bi destê jina evîndara xwe bigire û wê birevîne; pişt re biavêje mala kesekî bibext daku ew xwe bispêrin wê malê. Ev mal jî ne ji malên ji rêzê ne, malên mîr û beganan in, malên şêxan in, malên axayan in. Dengbêj cara ewilîn xwe diavêje mala misilmanan. Ji bo ku ew bibin ricaciyê Xwedê, ji bo ku miradê miradxwazan hasil bibe dengbêj û yara wî diçin ziyaretên giran, diçin li ba şêxên meşhûr, diçin li ba ewliyayan. Eger ku dengbêj negihîje mirazê xwe vê carê jî xwe diavêje bextê gawiran, bextê ejnebiyan, bextê fileyan, bextê xerîban, welatê xerîban. Di hin risteyan de ew xwe rasterast dixwaze ku ji bajarê lê dimînin derkevin û xwe biavêjin bajarekî din. Gava ku ew ê bikevin bextê bajarekî din ew bajar ji bo dengbêj êdî dibe bajarê şewitî. Piştî vê daxwaza xwe avêtina malekê dixwazin ku bibe, bi mirazê hev şa bibin. Eger ku bibe jixwe dibe, eger ku nebe xwe diavêjin bextê maleke din. Eger ku ew jî nebe dixwazin ku daxwazên dilê xwe bînin cih.

*“... tu rabe qasekî destê xwe li nava destê mi bixîne
ezê te birevînim bavêm mala Mîr Begê Mîrê di Mewalî
berxê ez ji te ra sond bixwim bi sonda qesemê bi navê Quranê
vê sibengê di dêrisê gunda da tim û tim cara
Birca Belek kela jorîn ezê bihêlim xik xalî...” (Kilama Ay Delal)*

*“... mi go kawê kubarê tu rabî ezê bi destê te bigrim birevînim
bavêm ber bextê axan û axalera, began û begleran, şêxan û şêxleran
heger biye jixwe biye heger ku nebiye
ezê birevînim bavêm ber bextê Xaçokî file
gidyo gelo vê sibengê ez ê bibêjim Xaço
tu bi xaçparêzê bavê xwe kî
mi dîlbera xwe avêtî ber bextê te bi tenê
ezê di bextê te û Xwedê ketime vê sibengê tu nizanî
ji bo dîlbera xwe nexweş im dilê mibi meraq e gidiyo cigera mi bi kul
e...”*

(Kilama Dîlberê Serê Mi Diêşe)

“... bê qewl û bê qiraro tu rabe destê mi keçikê bigire birevîne
bavê vê sibengê welatekî xerîb û xerîbistanê...”

(Kilama Ez Xezala Kedî)

“... digo kuro delaliyo tu rabe destê mi bigre birevîne
bavêj Şimplaka Jorîn Şimplaka Jêrîn
ber bextê mala Eliyê Felemez gelo li şewitiya lo li Baxçe ye
mi go qîza bêbava tu nizanî Mala Eliyê Felemez rabiye ranebiye
ji heft bavê xwe da bêbext e bext û agira lo wan tune ye
ezê bi destê te bigirim te bavê şewitiya Anzarê
ber bextê Yihsanê Mihemed Begê
rabiye ranebiye esilzade ye, xortekî ji xorta zêde ye
eger biye jixwe biye gava ku nebiye
ez te bavê ber bextê herdu lawê Hecî Hemzo
li şewitiya Sahakê Goma Kevir gelo vê sibengê
çuqas mal û serweta wan hebe li oxira lo min û te ye

...

hela rabe ezê bi destê te bigirim te birevînim
bavê şewitiya Avrêzê
li ber bextê Mala Seîdê Nado li şewitiya Anêrê
li tenişta ax lo vê Dêrikê
eger biye jixwe biye gava ku nebiye
te bavê şewitiya Elajgirê, etegê Kosedaxê li zozanê ax lo Berbezûkê...”

(Kilama Dêrika Ewranê)

“... ezê bi destê te bigirim çend rojeka
emê ji xwe ra derkevîne welatê xerîbê lê xerîbistanê
eger biye jixwe biye gava ku nebiye
emê berê xwe bidine welatê qurbetê
ji xwe ra her sê mehê zivistanê

derbas bikin li nava Êris, vê Rewanê berxê...

(Kilama Berxa Dilê Min)

*“... mi go gundo tu xirab bî, wêrano tu wêran bî
fesadî û şeytaniya xwe kirin, nehîştin ez û lawikê xwe va
qasekî rûnên bi destê hevdu bigrin, hevdu ji xwe ra birevînin
bavên ber bextê bavê Celal gelo vê sibengê mêrê mêrxas
gundo tu xirab bî dîsa şêrê gulî...”* (Kilama Dîlber Meraqê Min)

ENCAM

Şakiro gelek kilamên ku naveroka wan cuda ne gotiye. Di nav van kilaman de wî gotinên cûr bi cûr ên qalibgirtî dubare kiriye. Di dengbêjiya wî de hem ji kilamên ku wî afirandine, hem ji kilamên ku ne yên wî ne ev gotinên qalibgirtî û dubarekirî eşkere derdikeve li pêş me. Ji van forman cureyek jî ew form in ku li ser bedewiya jinê hatine avakirin.

Di dengbêjiya Şakiro de jin tên teswîrkirin. Ji bo teswîra tiştên xûyayî, bi ya tiştên nexûyayî û bi ya tiştên din formên ciyawaz lê yên ku tim di kilamên cuda cuda de hevpar in hatine çêkirin. Jin bi tiştên ku tên xûyan ên wekî bedena xwe û yên wekî kinc, amûr û tiştên din hatine teswîrkirin. Di kilaman de eşkere ye ku çav û bûrî, bejn, sîng, tûncik, natik û parçeyên beden ên din ên jina teswîrkirî çawan in. Ji bo her parçeyê, ji bo her organên li ber çavan gotineke qalib ava bûye. Herwiha ji bo cil û bergên jinan jî gotin hatine kirin. Kofi, timtêla, xizêm, mêzera wan çawan e; elb, desmal û tiştên din ên di destê wan de çi ne; ev jî diyar in. Di kilaman de behsa unsurên nexûyayî yên jinan jî hatiye kirin. Hem karakter ku nezani, xeberxweşî, xeydokî û tiştên din tê de; hem jî tevger ku milmilîn, meşa li ser avê û tiştên din jî tê de; bûye kereste ji bo avakirina kilaman. Ji xêynî van jin bi xezalan re, bi berxan, re, bi kewan re û bi hin ajalên din re hatine şibandin. Dema ku dengbêj bang li wan kiriye bi navê van ajalên banga xwe kiriye. Teswîra jinan tenê bi van tiştan ne sînordar e. Şakiro hey caran eşq û bedewiya jinan şibandiye ya Mem û Zînê, hey caran ji bo nîşandan qîmeta jinan mal û milkê dinyayê qebûl nekiriye. Gelek caran di kilaman de ji bo yara xwe bûye xwediye derdekî sertacê hemû derman, li dermanan geriyaye. Wî jin ewqas berz kiriye ku sond û qesem kiriye. Ev unsur jî wek gotinên qalibgirtî tevî kilamên wî bûne.

Di kilamên Şakiro de bi van teswîran jin hatine îdealîzekirin. Jinên ku tevî kilaman bûne bi van gotinên qalibgirtî bedewtirîn hatine nîşandan. Herwiha profileke îdealîzekirî ya jinan, kilamên ji gotinên xweşiktirîn hatine avakirin.

ÇAVKANÎ

- Aras, A. (2017, 12 24). *Kilama Kurdî û Dengbêjiya Serhedê*. Kovara Bîr: <http://ijoks.com/tr/download/article-file/90128> hate hildan. Dema dîtîne: 09.12.2020.
- Bozarslan, M. E. (1968). Mem û Zîn. E. Xanî içinde, *Mem û Zîn* (s. 11). İstanbul: Gün Yayınları.
- Bozkoyun, M. (2015). Beşek Ji Folkloru Kurdî: Çîrok. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 143.
- Cebe, R. (2012). Dengbejlik ve Melizma Tekniği. *Batman Üniversitesi Yaşam Bilimleri Dergisi*, 1156.
- Çifçi, T. (2015). Di Çarçoveya Çanda Devkî De Di Nav Civaka Kurdan De Dengbêj û Saziya Dengbêjiyê. *International Journal of Kurdish Studies*, 118.
- Demir, Kamuran; Polat, Fecri. (2015). Pêşgotin. Homeros içinde, *Îlyada* (s. 17). İstanbul: Heyamola .
- Güneş, Ö., & Şahin, İ. (2019). *Dengbêj Şakiro*. İstanbul: Nûbihar.
- Kardaş, C. (2012). Tarihsel Olayların Dengbêjler Aracılığıyla Sözlü Kültüre Aktarılması. *Journal of Life Sciences*, 201.
- Kaynar, C. (2018). Dengbêjiyê De Li Dor Temaya Şer û Kuştinê Nirxandina Kilamên Şînê. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 69.
- Kevirbirî, S. (2009, 2 16). *Mirbotan.com*. <https://www.mirbotan.com/sanatci-hayati-amp-biyografi/21745-dengbej-sakiro-salih-kevirbiri.html> hate hildan. Dema dîtîne: 14.12.2020.
- Kürtler.com*. (2019, 05 02). <https://www.xn--krtler-3ya.com/kurt-ozani-dengbej-sakiro-kimdir-hayati.html#:~:text=%C5%9Eakiro%2C%201936%20y%C4%B1%C4%B1nda%20A%C4%9Fr%C4%B1'da,olarak%20g%C3%B6%C3%A7%20etmek%20zorunda%20kalm%C4%B1%C5%9Flard%C4%B1r>. hate hildan. Dema dîtîne: 11.12.2020.
- Oncu, M. (2013). Pêşgotin; Dengbêk û Dengbêjî. H. Ekîncî içinde, *Dengbêjî* (s. 11). İstanbul: Ajans J&J.

- Polat, F. (2020, 11 25). Îfadeyên Qalibgirtî Yên Dengbêjîyê. (K. Demir, Röportaj Yapan)
- queenelifabeth. (2004, 05 28). ekşisözlük: <https://eksisozluk.com/yusuf-ile-zuleyha--209846?p=1> hate hildan. Dema dîtinê: 16.12.2020.
- Şakiro û Têkilîya Bi Reso re. (2020, 13 12). Seregola Intabê: <https://www.seregolaintabe.com/sakiro-u-tekiliya-bi-reso-re/> hate hildan. Dema dîtinê: 18.12.2020.
- Uzun, M. (2005). *Dengbêjlerim*. İstanbul: İthaki.
- Yerêvanê, K. (2014, 7 5). Youtube: https://www.youtube.com/watch?v=EDv3GY_qUNM hate hildan. Dema dîtinê: 22.12.2020.
- Yıldırımçakar, M. (2020). Dengbêjiya Jinê Ji Hêla Patronaj, Perwerdehî, Rol û Nêrîna Civakî û Îcrakirina Hunerê Ve. *Kovara Kurdînameyê ya Navnetewî*, 90.
- Yıldız, A., & Taşkın, H. (2018). Beşa Yekem. *Şakiro-Kewê Ribat* (s. 24-31). içinde İstanbul: Nûbihar.
- Yorulmaz, A. (2017). 'Dengbêjler ve Sözlü Tarih' Dosyası Üzerine Bir Eleştiri. *Kürt Tarihi*, 53.

WÊNE









